Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1359 | 15-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 'Min xwest ez di tabloya xwe de yekîtiya Kurdan bidim xuyakirin'

Esmihan Gedro/Qamişlo

**Wênesaza bi navê Zozan Betal anî ziman ku ew di nava malbateke hunerî de jiyan dike. Zozan da zanîn ku wê xwest hêz û berxwedana şervanên jin û yekîtiya Kurdan di tabloya xwe de bide xuyakirin.**

Zozan Betal wênesazeke jin a Kurd e li bajarê Qamişloyê ye ku ev gelek carin tabloya wê derbasî Siwêd, Bakistan û Başûrê Kurdistanê bûye. Dema wê navê Kurdistan û keziya jina azad xêz kir ew tabloya wê derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Wê ev tablo beşdarî Pêşangeha Berxwedana Rûmetê ya Wênesaziyê kiriye. Derbarê vê tabloyê de Zozan Betal ji Rojnameya me re axivî.



### 'Ez di malbateke hunerî de dijîm'

Zozan Betal da zanîn ku ew ji malbatek hunerî û wênesaz e û wiha axivî: "Hevjîn û zaroka min jî şêwekar in. Lê tabloya min cudayî yê wan e. Ev bû 13 sal in ez karê wênesaziyê dikim. Hevjîn û kurê min bi ikîlib û fehim wênesaziyê dikin, lê ya min gelekî balkêş e ji ber ku bi kaxetan hatiye çêkirin, ez tu rengan bi kar nayînim tenê bi kaxizan çêdikim ji ber vê yekê ew ji hemû tabloyan cudatir e. Herwiha min xwest ez di vê pêşengeha "Berxwedan Rûmetê" de tabloya xwe parve bikim. Tabloya min ifadeya komkujiya ku li Şêxmeqsûd pêk hat ku çawa hevala jin ji jor de avêtin erdê û keziya wê wisa dimîne li erdê. Min jî weke jineke Kurd xwest ez di tabloya xwe de hêza jina Kurd û berxwedana wê û tekoşîna vîna jinê diyarî xelkê bikim, bila bizanibin tu carî keziya jina azad nayê birîn. Ger bi wênesaziyê be jî em ê tekoşîna jin bidin ber çavan. Ez tabloyên xwe hemiyan bi kaxetan wêne dikim wan kaxetan diqûsînim û pê gulan û tiştên destan çêdikim gelek şêweyên erkanê wê hene. "

### Min xwest ez di tabloya xwe de yekîtiya Kurdan nîşan bidim

Zozan betal da zanîn ku wê xwest yekîtiya Kurdan di tabloya xwe de biteyîsîne û wiha domand: "Ev tablo çar rojan di nava destê min de ma. Gelek zehmetî û sebir dixwaze. Li gorî ku ez tevî zarokên xwe û hevjînê xwe me, min dev ji wênesaziyê bernedaye tevî van zehmetiyan hevjînê min dibe alîkar bi min re. Min ji xwe gelek pêşengeh yên weke kolektîf, şexsî û hwd... çêkirine. Herwiha min li Başurê Kurdistanê jî wênesazî kiriye tev malbata xwe tabloyên kolaktîf pêşkêş kirine. Ji xwe weke em dibînin di tabloyên me de hemû kezî ne bi rastî gelekî dilê me Kurdan êşand van bûyeran. Yê ku çeteyên dewleta Tirk xwe pê didît, em jî gelek bi wê bûyerê diêşiyan, lê ev bûyer bû sembola berxwedanê ji şervanên Kurd re. Di tabloya min de du şervan in yek dûrî dixe êşa xwe, xweşiya xwe dibêje û ya din jî keziya wê şervanê keç dihûne. Min jî xwest ez di tabiloyê de yekîtiya Kurdan bidim xuyakirin û bi yekîtiya gelê Kurd em ê Kurdistanekê ava bikin."

### 'Bi rêya êş û xemgîniyê tablo saz dibin'

Zozan destnîşan kir ku wênesazî bi riya êş û xemgîniyê tablo tên sazkirin û wiha bi dawî kir: "Wênesazî ji piştgiryê tê, ji dilê mirov û tiştê di hundirê wê de derdixe ber çav. Dema ku ew kesê wêneyê bi xêzên xwe rêzikan xêzdike êş û xemgîniya xwe di tabloya wêneyî de şîrove û xuya dike. Tevî zehmetiyên ku em niha tê de jiyan dikin, lê dîsa em dest ji wênesaziya xwe bernadin û her tim wê tabloyên me yên dewlemend bimînin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li xwe da:**
- Ji tişta kirî (yan jî ji bo tişta nekirî) pir poşman bû.

**Mêrik na pîrê pişt re guneh hat bîrê:**
- Dema sûc dikir tiştek ne li xema wî bû, pişt re li xwe dida.

**Min pora xwe kur kir:**
- Min tişteke xirab kir; xwezî min nekira.

**Min keziya xwe kur kir:**
- Bi heman wateyê.

**Min zimanê xwe gez kir:**
- Min tiştek got lê zû poşman bûm.

**Nangenimiyan dike:**
- Dixwaze xwe bide efûkirin; poşman bûye.

**Piştî tirê kezîkurê:**
- Dema piştî şaşîtiyekê, xetayekê, kêmayiyekê yek li xwe dide, poşman dibe hingê tê gotin.

**Weke yê li qaşilê zebeşan vegeriyayî:**
- Ji bêderfetî li tiştên xwe yên bêkêr vegeriya.

**(Yek zebeşekî dişkîne dixwe û bi qaşilên wî ve dimîze; piştî demekê diçe wan qaşilan jî dixwe)**

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi kamîreya Ayşa Silêman



Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## 'Fitne ji kuştinê xerabtir e!'

Di demekê de ku hemû çav li ser şerê di navber Îsraîl û DYA û li aliyê din Îranê de ne, li Sûriyê tevlihevî û alozî dewam dikin. Tevî ku Peymanek di navber QSD'ê û HTŞ'ê de pêk hat ku bi peymana 29'ê Çile tê naskirin. Navaroka peymanê zêde nehatiye eşkerekirin lê ya ku niha pêk tê ew e ku bendên kontrolê yên hevpar li Rojavayê Kurdistanê tên avakirin tenê hêzên ewlehiya hundirîn parastina ewlehiyê digre. Dîsa mijara vegera Efrîniyan û berdana ciwanên Kurd ên girtî û kurdên ku hatibûn revandin heye. Hêjmareke malbat bi komî di bin çavdêriya Asayîşê de vegeriyan Efrînê lê heta niha li wir malên wan desteserkirî ne. Dîsa êsîrên ku çend roj berê hatin berdan, eşkere kirin ku bi sedan Kurdên ji Şêxmeqsûda Helebê ku di dema êrişan de hatibûn girtin jî hîne di zîndanên HTŞ'ê de ne. Her çiqasî ev mijarên niha me anîbin ziman bi rê ve diçin, lê hemleya tehrîdkirina li dijî Kurdan û QSD'ê ji aliyê kesên ser bi HTŞ'ê ve bi dawî nebûye. Li aliyekî li rojavayê Kobanê li derûdora bajarokê Şêxler êrişî mal û milkê Kurdan hat kirin û li Girê spî jî êrişî Ciwanekî Kurd hat kirin û Erebeya wî hat şewitandin. Ev kesên êrişkar hemû DAIŞ'î ne û gelek ji wan bi soza serokên eşîrên Ereb bi QSD'ê re hatibûn berdan. Li gundên rojavayê Kobanê jî erebên ji Şêxler ku niha êrişî Kurdan dikin, ew jî berê di nava êrişîn sala 2013'an û 2014'an ên komên artêşa azad û paşê jî DAIŞ'ê de cih girtibûn û beşek jê bûn. Piştî ku YPG'ê ev herêm ji DAIŞ'ê rizgar kirin, ev kes reviyan Tirkiyê an jî herêmên di bin kontrola dewleta Tirk de.

Her wiha li Serêkaniyê jî ew endamên DAIŞ ku paşê di bin navê artêşa niştîmanî ya Sûrî ku dewleta Tirk avakiribûn de, derketin kolanan û gef li Kurdan xwarin û gotin ku ew rê nadin ku Kurd vegerin Serêkaniyê û kî vegere ew ê were kuştin.

Li aliyê din, li ser navê hin Kurdan jî dîsa êrişeke berfireh li ser tevnên civakî hat dest pêkirin. Ew êriş jî bi armanca belavkirina kîn û nefretê di nava Kurdan de bû û hemû sazî û kesayetên Rojava yên naskirî hedef bûn. Destpêkê mijara Kuştina kesê bi navê Elaa û paşê şewtandina konê Şînê bû ku qaşo ew parazvanên mafê mirovan in û doza edaletê dikin, di demekê de ku li Şêxler û Girê Spî êrişî û sorkirina li dijî Kurdan de, tu deng ji wan kesan dernediket. Ev jî dide xuyakirin ku hemleyeke tevlihevkirina herêmên Kurdan him ji hundir û him jî ji derve de piştî êrişên leşkerî ketiye dewrê. Herçiqasî daxuyaniya Fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî derbarê bûyera êrişî konê Şînê yê vî kesî de pêşî li fitnê girt, lê ew alî di gelek mijaran de dixwazin tevliheviyê derbixin û derbarê vê yekê de hişyariyeke zêde lazim e. Yên ku berê di bin navên cûda de êrişî rêveberiya xweser dikirin, niha jî di bin hin navên din de êrişî kes û saziyan dikin û dixwazin mêjiyê milet tevlihev bikin. Lewma divê her kesên berpiryar û rêveber, karê xwe baş bikin û xwedî li wan erkên xwe derbikevin.

## Di Rojhilata Navîn de "Jin û dîplomasî" çiqas hevdu temam kirine?



Beşdariya jinan di dîplomasiyê di deh salên dawî de li çar aliyê cîhanê hêdî hêdî zêde dibe, lê serjimar nîşan didin ku jin hîn jî di pozîsyonên dîplomatîk ên bilind de, nemaze wekî balyoz an nûnerên daîmî yên rêxistinên navneteweyî, ji mêran pir kêmtir temsîl dibin. Ev valahî li Rojhilata Navîn jî, hîn bêtir diyar e.**R-2**

## 'Koçberên Serêkaniyê bendewar in rêkeftina 29'ê Çile deriyê vegera biewle veke'



Koordînasyona Ragihandinê ya Komîteya Koçberên Serêkaniyê Dilo Mihemed Elî diyar kir ku her çendî şert û mercên jiyana koçberiyê gelek dijwar be jî, lê ew hêvî di dilê koçberên Serêkaniyê de hîn heye ku rojekê vegerin ser mal û milkên xwe û got, "koçberên Serêkaniyê bendewar in ku rêkeftina 29'ê Çile deriyê vegera bi rûmet û ewle ji bo wan veke."**R-4**

## Ji bo Rojhilata Navîn projeya Neteweya Demokratîk derman e



Rêber Apo Neteweya Demokratîk wekî çareseriyeke bingehîn ji bo pirsgirêkên Rojhilata Navîn pêş dixe, da ku şerên navneteweyî û etnîkî bi dawî bîne. Rêber Apo dibêje: "Eger Neteweya Demokratîk giyan be, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk beden e."**R-5**

## Newroz sembola roj û destpêkeke nû ye



Peyva Newroz tê wateya "nû" û "roz" jî tê wateya "roj", ji ber vê yekê Newroz sembola roj û destpêkek nû ye. Ew destpêka salek nû û vegera biharê pîroz dike, demsalek bi girîngiya giyanî ya mezin, ku sembola serkeftina qenciyê li ser xerabiyê û şahiyê li ser xemgîniyê ye.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1359 | 15-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# SALIH MUSLIM; ÇINARÊ ŞOREŞÊ Û DOZA KURDÎ

Pêşengê Kurd Salih Muslim ku di nava qada siyasî û dîplomatîk de têkoşîneke bê hempa da meşandin di 11'ê Adarê bi sedema nexweşiyê şehîd bû. Salih Muslim bi dehê salan ked, xebateke hêja û binirx da meşandin, da ku doza Kurdî û yekîtiya gelê Kurd pêkbê, li ser wê armancê heya kêliya dawî dixebitî. Herwiha Muslim bû çinarê Şoreşa Rojava û doza Kurdî, ji bo wê ew ê di bîrdanka gelê Kurdistanê de bimîne pêşengê siyasetmaderan.**R-3**



## Buhayê penêr di aramiyeke berbiçav de ye

Îbrahîm Mamo ku xwediyê firoşgehek penêr li bazara Qamişlo ye, piştrast kir ku buhayên penêr îsal li gorî sala borî tu guhertinek mezin nedîtiye û got, "Dê di destpêka werzê penêr de, wê mîqdarên mezintir li bazaran û zêdebûna çalakiya firotanê hebe."**R-8**




Ramanên Rêber Apo pergala kê dihejîne?
İsyan Karadeniz R-2



Guhertinên Herêmî û Vegera Şêniyên Efrînê Di Hesabên Jeopolîtîk û Îradeya Gelan De
Idrîs Henan R-4



Têkoşerek ji dil: Bavê Welat
E.Pêjder Altan R-6



CEJN Û KÊFXWEŞÎ
Hafiz Ahmet Turhalli R-7

# Di Rojhilata Navîn de “Jin û dîplomasî” çiqas hevdu temam kirine?

Beşdariya jinan di dîplomasiyê di deh salên dawî de li çar aliyê cîhanê hêdî hêdî zêde dibe, lê serjimar nîşan didin ku jin hîn jî di pozîsyonên dîplomatîk ên bilind de, nemaze wekî balyoz an nûnerên daîmî yên rêxistinên navneteweyî, ji mêran pir kêmtir temsîl dibin. Ev valahî li Rojhilata Navîn jî, hîn bêtir diyar e.

**Esma Mistefa**

**Di Rojhilata Navîn de beşdarbûna jin di xebatê dîplomasî de**

Beşdariya jinan di xebata dîplomatîk de li Rojhilata Navîn di dehsalên dawî de, di nav veguherînên siyasî û civakî yên bilez ên ku li welatên herêmê diqewimin, pêşkeftinek berbiçav dîtiye. Jinan dest bi cihgirtina cihên girîng di wezaretên karên derve û mîsyonên dîplomatîk de kirine, û kesayetiyên jin ên navdar derketine holê ku di temsîlkirina welatên xwe de li ser sehneya navneteweyî rolên bi bandor lîstine. Di vê sergotinê de hêjaye ku em balê bikşînin ser yek ji wan mînakên hêjayî bîrxistinê ye di Rojhilata Navîn de û bi taybet Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ku bi pêşengtiya jinan di hemû faktorên civakê de, bûne mînakên birêvebirina xebatên dîplomasî, siyasî, civakî û leşkerî. Lêbelê, di welatên Rojhilata Navîn de rêya jinan ber bi gihîştina cihên rêveberiya payebilind di karûbarên dîplomatîk de hîn jî bi hin astengiyan re rûbirû ye. Lê ger em lêkolîn bikin jêder didin diyar kirin ku hebûna jin di xebatên dîplomasî de di van çend salên dawiyê de hinekê pêş ketiye, li gorî demên berê.

**Bi nêrandineke navnetewî**

Jin di dîplomasiya navneteweyî de roleke girîng dilîzin, hebûna wan beşdarî pêşxistina pirrengiyê, avakirina baweriyê û balkişandina ser mijarên aştî û ewlehiyê dibe, bi vî awayî aliyek mirovî ya berfireh li têkiliyên navneteweyî zêde dike. Lêkolîn nîşan didin ku hêzdarkirina jinan di vî warî de êdî ne tenê daxwazek navneteweyî ye, lê belê nêzîkatiyek stratejîk e ji bo çareserkirina nakokiyan bi awayên bê pevçûn û bidestxistina pêşveçûnek domdar. Di asta navnetewî de roja 24’ê Hezîranê roja cîhanî ya xebatê jin di dîplomasiyê de hatiye diyar kirin. Di vê navberê de mirov dikare hebûna jin di xebatên dîplomasî de weke hebûneke dadmend di çareserkirin, avakirin û xurtkirina têkiliyan her wiha avakirina atmosfereke ji aştî û aramiyê di xebatê de, bide tekezkirin. Di roja îro de di asta navnetewî de kes nikare hebûn û serkeftina jin di vê warî de tune bihesibîne.

**Pêşketineke girîng di beşdarbûnê de… jina Kurd mînaka herî wetedar e**

Berê, dîplomasî li Rojhilata Navîn qadeke hema bêje bi tevahî ji aliyê mêran ve dihat birêvebirin. Lêbelê, di salên dawî de ev rastî hêdî hêdî guherî ye, û hejmareke zêde ya jinan tevlî wezaretên karên derve dibin an jî di balyozxane û mîsyonên navneteweyî de cihên dîplomatîk digirin.

Di vê beşê de gelek mînak û modelên jin derketine holê. Lê ev yek ger em lêkolîn bikin wê tenê çend mînakên ji dewletên Erebistana Siudiyê, Îmarat û çend welatên li derdor bidin xuyakirin. Ema di sedsala 21’emîn de yên ku hebûna xwe di warê dîplomatîk de li ser asta Rojhilata Navîn cih girtine û ev xebat bi sekina xwe bi wate kirine; jina Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ango li Rojavayê Kurdistanê ku karîn ev xebat bi îdeolojiya Şoreşa Jinê ya ku ji 15 salan ve bi Aloziya Sûriyê re hatiye destpêkirin re, bi rengê jinê wetedartir kirin. Bi felsefe û bîrdoziya Rêber Abdullah Ocalan ya ku pêşengtiya ji vê felsefê re kiriye, jinan di Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe perwerde kirin û bûn pêşeng ji jinên pêkhateyên din re.

Jinên Kurd bi pêşketina geşedanan re ne tenê pêşengtî di qadên civakî de kirin, di Rojhilata Navîn de yekemîn jinên ku di xebatên siyasî, leşkerî û dîplomasî de di sedsala 21’mîn de bûn nava pergaleke zayendperest de karîn pêşengtiyê ji civakê re bikin; Jinên Kurd li Rojavayê Kurdistanê bûn. Îro em dibênin ku di asta herî jor de yek ji mînakan Birêz Îlham Ehmed, Fermandar Rohilat Efrîn, Fuza Yûsif û bi sedan jinên Kurd li çar aliyên Kurdistanê di asta Rojhilata Navîn de ku di qada leşkerî, siyasî û dîplomasî de cih digrin hene. Îlham Ehemed di Koşka spî de kiryarên ku li ser jin, zarok û gelê Kurd ji aliyê dijmin û komên çeteyan ve hatine kirin, belgekirin û dengê gelên bindest gihand raye giştî. Her wiha weke Hevseroka Têkiliyên Derve di Rêveriya Xweser de, di avakirina têkiliyan û danûstandin de bi hemû dewletên cîhanê û yên herêmî re, jina yekem bû.

Em çima dixwazin balê bikşînin ser van kesayetan, ji ber ku dema em lêkolîn dikin, dibe ku bi sedan ji jinên Rojhilata Navîn niha pêşengtiyê dikin û ked didin, lê tenê dewletên sermeyadar yên weke Erebistana Siudiyê, qetar û Îmarat tenê mînakan ji gel xwe derdixînin. Weke ku di Rojhilata Navîn de jin pir pêşketî bûye, sînorên civakî û pergalê li pêşiya wê nemane û jin dikare pir hêsan cihê xwe di xebatên dîplomasî de bigre, û mînaka wê jî welatê xwe dide!!

Beşdariya jinan di dîplomasiyê de di dehsalên dawî de li çaraliyê cîhanê hêdî hêdî zêde dibe, lê serjimar nîşan didin ku jin hîn jî di pozîsyonên dîplomatîk ên bilind de, nemaze wekî balyoz an nûnerên daîmî yên rêxistinên navneteweyî, ji mêran pir kêmtir temsîl dibin. Ev valahî li Rojhilata Navîn jî, hîn bêtir diyar e.



**Rêjeya jinan di karên dîplomasiyê de li cîhanê**

Raportên navneteweyî yên dawî nîşan didin ku jin hîn jî rêjeyek sînorkirî di postên dîplomatîk ên bilind de digirin. Li gorî nîşana (endeksa) “Jin di Dîplomasiyê de” ya 2025’an, jin tenê nêzîkî 22.5 ji sedî ji hemî balyoz an nûnerên daîmî yên cîhanê pêk tînin. Daneyên din jî nîşan dan ku nêzîkî 21 ji sedî ji balyozên cîhanê jin in, ev tê vê wateyê ku nêzîkî çar-pênc cihên dîplomatîk ên bilind hîn jî ji hêla mêran ve têne girtin.

Ev hejmar nîşan didin ku pêşketin di warê bidestxistina wekheviya zayendî di karê dîplomatîk de hêdî pêşve diçe, tevî hewldanên navneteweyî ji bo pêşvebirina beşdariya jinan di siyaseta derve de.

Rêjeya beşdarbûna jinan di karûbarên dîplomatîk de li gorî herêmekê diguhere. Amar nîşan didin ku:

Amerîka: Nêzîkî 28–29 ji sedî ji balyozan jin in. Ewropa: Nêzîkî 27–29 ji sedî ji balyozan jin in. Afrîka: Bi qasî 20–22 ji sedî. - Asya: Nêzîkî 13–14 ji sedî. - Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê: tenê nêzîkî 10–11 ji sedî tenê jin temsîl dikin.

Ev hejmar nîşan didin ku herêma Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê di nav herêmên cîhanê de ye ku ji hêla jinan ve di karûbarên dîplomasiya bilind de di nav herêmên herî kêm de temsîl dike. Ev yek li gorî navînîya cîhanî kêm e, û ji sedî 10-11’ê balyozan derbas nabe.

Berevajî vê, hin welatan di dîplomasiyê de temsîliyeta jinan bi astên bilind bi dest xistine, û heta nêzîkî wekheviya zayendî bûne. Di nav van welatan de yên herî berbiçav ev in:

- Kanada: 53 ji sedî balyozan jin in. Siwêd ji sedî 51. Finlanda ji sedî 50. Kosta Rîka û newzîlanda: Ji 45 ji sedî zêdetire.

Ev welat di nav saziyên siyaseta derve de di polîtîkayên wekheviya zayendî de di nav yên herî pêşketî de ne.

Berevajî vê, hin welat hîn jî rêjeyên pir kêm ên temsîla jinan di xizmeta dîplomatîk de tomar dikin, û hin ji wan ji bo demek dirêj jinek jî wek balyoz tayîn nekirine. Di nav welatên ku hema hema temsîla jinan tune ye de ev hene:

Belarûsiya- Korîya Bakur- Togo- Fîjî. Li van welatan rêjeya jinan di postên balyozxaneyan de ji sedî 0 tomar kiriye.

Pirsgirêkên ku li pêşiya jin di Rojhilata Navîn de dibin bend çi ne?

Faktorên civakî û çandî

Li gelek civakên Rojhilata Navîn, ramanên kevneşopî yên li ser rola jinan di pêşengtiyê de hê didome, û siyaset û dîplomasî pir caran wekî warên ku ji hêla mêran ve serdest in têne dîtin. Ev perspektîf derfetên jinan ji bo gihîştina meqamên serokatiyê sînordar dike.

Derfetên sînorkirî di cihgirtina asta serokatiyê de

Dema ku jin di Wezareta Derve de dixebitin jî, ew pir caran ji ber tiştê ku jê re “banê cam” tê gotin (ango hebûna astengiyên nefermî yên ku rê li ber pêşveçûna wan digirin), nagihîjin pozîsyonên bilind ên wekî balyoz an nûnera daîmî.

Xwezaya karê dîplomatîk

Karê dîplomatîk pêdivî bi van tiştan heye: Geryana berdewam, xebata li welatên cuda, saetên xebatê yên dirêj. Di hin civakan de, ev şert û merc ji ber berpirsiyariyên malbatî an jî astengiyên civakî ji bo jinan ne guncaw têne hesibandin.

Cudakarî û newekhevî di kar de

Li hin welatan, wergirtina kar û terfîkirin carinan li ser bingeha têkilî an jî berjewendiya civakî ne, ne tenê li ser bingeha jêhatîbûn û serkeftibê, ev yek dikare derfetên jinan ji bo ketina nav xebatên dîplomasiyê sînordar bike.

Di encamê de, dikare were gotin ku hebûna jinan di dîplomasiyê de li Rojhilata Navîn gav bi gav ber bi jor ve diçe, lê dîsa jî ji bo ku temsîliyeteke hevsengtir di navbera jin û mêran de di saziyên siyaseta derve de pêk were, pêdivî bi reformên zêdetir û polîtîkayên piştgir heye.

Akademiya Jîneolojî

## Ramanên Rêber Apo pergala kê dihejîne?

İsyan Karadeniz

Di demên dawî de, sînorek ji bo tundiyê tune ye. Ev êrîş ne tenê dijberiya siyasî ne, lê di heman demê de îfadeya tirsek kûr a ji paradîgmayê ne. Ji ber ku rêbaza demokratîk, ekolojîk û rizgariya jinan a ku ji hêla Rêber Apo ve tê pêşkêş kirin, rasterast li dijî dewleta neteweyî, serdestiya modernîteya kapîtalîst dijberiyek e.

Di vê paradîgmayê de, dewlet ne pîroz e; ya pîroz civak e, nasname ne hêmanên ku werin tepeserkirin in, lê bingeha jiyana hevbeş in. Ger em dixwazin van êrîşan fam bikin, divê em paradîgmaya Rêber Apo baş fam bikin. Divê em mijara azadiya jinê bigrin dest, li ekolojiyê binêrin; ew bingehên jiyanê ne. Ji ber ku ev nêzîkatî avahiyên desthilatdariyê yên damezrandî têk dibe, desthilatdariya navendî belav dike, an jî hiyerarşiyê dixeber pirsyarê û zimanê serdest ê mêran dişkîne. Ji ber ku îro, textê ku ji hêla hin kesan ve hatî damezrandin dihejîne, rêzik tê têkbirin. Ev sedema êrîşên bingehîn e.

Mijareke din ji nêzîkatiya rewşenbîr an kesên ronakbîr e. Ji ber ku ev nêzîkatî û êrîş di bin navê rewşenbîran de têne kirin. Beşek girîng ji yên ku jê re dibêjin qaşo rewşenbîr in şuna ku bi nivîsên xwe li ser vê dinyayê û vê ramanê nîqaş bikin, reş kirin û heqaretê tercih dikin. Lêbelê, rewşenbîr bûn, ronakbîr bûn tê wateya xwendin, têgihîştin û rexnekirina heta ramanên dijber jî - û ez dibêjim ramanên dijber ji ber ku ev girîng e - gerek heqê wê were dayin. Lê nêzîkatiyek heye ku bi zimanekî jehrîn, bêyî xwendin an têgihîştinê tiştan digire dest. Dadwerkirin bêyî xwendinê an êrîşkirin bêyî analîzkirinê ne cesareta rewşenbîrî ye, lê dibe ku, bi wateya xwe ya herî hêsan, nezanî ye.

Li ser medyaya civakî, li nivîsan binêrin; zimanekî heqaretê heye. Her ku zimanê heqaretan zêde dibe, arguman qels dibe; her ku deng zêde dibe, naverok vala dibe. Dema ku em bi vî rengî nêzî wê dibin, em çêtir dibînin ka kî van êrîşan dike, kîjan karakter li pişt wan in.

Bê guman, aliyê ku neteweperesiya Kurd diparêzin jî heye. Refleksên neteweperest çavkaniyek din a van êrîşan in. Mînakê, neteweperestiya prîmîtîv pirrengiyê wekî gef dibîne. Ew ji bo yek nasnameyek, yek ziman, yek bawerî, ango yekrengiyê parêzvaniyê dike. Lêbelê, dema ku em li rastiya dîrokî ya Mezopotamyayê dinêrin, em piraniyek dibînin ku tê de gel û bawerî bi sedsalan bi hev re jiyane. Di vê wateyê de, tek/yek meyleke faşîst e. Tiştê balkêş ev e ku zimanên çapemeniyê û pratîkên van neteweperestên prîmîtîv cuda ne. Mînak, di serdema dawî de, neteweperestên qaşo yên bi navê Kurdan, yekîtiya Kurdan dixwazin. Ev pir watedar e, taybet ji di vê pêvajoyê de. Lê heke hûn vê yekê bi gotarek dijî-Ereb bikin û dûv re planan çêbikin ku li pişt perdê bi wan re hevdîtin bikin, tê çi watê ye? Yên ku êrîşî ramanên Rêber Apo dikin, êrîşî biratî û yekîtiya gelan dikin.

Êrîşeke din a bingehîn bi rastî li ser rizgariya jinan e. Çima ew bi rastî ji rizgariya jinan ditirsin, çima jineke azad nayê xwestin?

Ne tesaduf e ku nêzîkatiyeke siyasî ku azadiya jinan dixe navendê bi taybetî tê hedefgirtin. Ji ber ku çanda siyasî ya ku ji hêla mêran ve serdest e, mijara jinan wekî gef dibîne. Ji ber vê yekê, ew jineke azad naxwaze. Mînakî, têgehên wekî hevserokatî, saziyên jinan û jineolojî ne tenê vebûnên teorîk in, lê di heman demê de îdîayek berbiçav a hêzê ne.

Tevî van hemî êrîşan, gotin û helwesta me zelal e, û em bi inad dibêjin, “biratiya gelan”. Ji ber ku ev rastiya vê erdnîgariyê ye, an jî em bi awayekî inad dibêjin, “azadiya jinan”. Ji ber ku civakek azad bi jinek neazad nayê avakirin. Aştî, gelemperi û demokrasî, fikra civakek demokratîk, bi ramanan têne nîqaş kirin, pêdivî ye ku armancên kesên ku van êrîşên bêwijdan dikin bi awayekî rast werin şîrovekirin.



# Îran zêdetirî 5 hezar car hatiye hedefgirtin

Di şerê Amerîka-Îsraîlê li dijî Îranê û di seranserî 14 rojên borî de, Fermandariya Navendî ya Hêzên Amerîkayê eşkere kir ku wan li 5 hezar hedefên li Îranê xistine û zêdetirî 50 keştî û jêrderyayiyên Îranê hedef girtine.

**Navenda Nûçeyan**

Piştî deh rojên ji şerê Amerîka-Îsraîlê li dijî Îranê, gelek êriş û hedefên berfireh ku gihîşt bi pêkaîna zêdetirî 5 hezar car hedefgirtin, di nav de yên êrişên bejahî, deryayî û hewayî, ku ev yek bastratejiyeke berfireh a Amerîka-Îsraîlê eşkere kir ku armanc ew bû ku pergalên ewlehî û îstîxbaratê yên Îranê qels bike û dibe ku heta hikûmetê jî hilweşîne.

**Washington hejmara hedefên ku li Îranê xistiye eşkere dike**

Koşka Spî roja Sêşemê di 10’ê Adarê de ragihand ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê êrişî zêdetirî 5 hezar hedefên li Îranê kirine. Herwiha berdevka bi navê Koşka Spî Carolyn Leavitt diyar kir ku êrişên mûşekên balîstîk ên Îranê ji destpêka şer di 28’ê Sibatê de ji sedî 90’î zêdetir kêm bûne di heman demê de êrişên bi dronan jî bi qasî ji sedî 85 kêm bûne. Wiha lê zêde kir: “Piştî derbasbûna deh rojan, ev hemle serkeftinek mezin bi dest xistiye.”


Carolyn Levitt roja Sêşemê 10’ê Adarê di civîneke çapemeniyê de, diyar kir ku artêşa Amerîkî niha gavan diavêje da ku tesîsên hilberîna mûşekan ên Îranê hilweşîne. Herwiha tekez kir ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ber bi armanca xwe ya leşkerî ya jiholêrakirina hêza deryayî ya Îranê ve pêşketinê çêdike û behsa wêrankirina zêdetirî 50 keştîyên şer ên Îranê kir.

**Zêdetirî 5 hezar cihên cûda hatine hedef girtin**

Di heman çarçoveyê de Fermandariya Navendî ya Hêzên Amerîkayê têkildarî şerê 10 rojan yê li gel Îranê de agahiyên nû di rêya daxuyaniyekê de parve kir û hate diyarkirin ku di nava 10 rojên borî de wan di êrişên xwe de jêrxana leşkerî û ewlehiyê li Îranê hedef girtine û got: “Zêdetirî 5 hezar cihên cûda hatine hedef girtin, ji wan hedefgirtinan baregeha fermandariya Pasdarên Şoreşê, navenda çêkirina diron û mûşekên balistîkî, qaîdeyên avêtina mûşekên li dijî keştiyan.” Her wiha hatiye diyarkirin ku zêdetirî 50 keştî û jêrderyayiyên Îranê hatine hedefgirtin. Di daxuyaniyê de hatiye gotin ku di êrişan de balafirên ji cûreyên cûda yên şer ên pêşketî ji bo têkbirina tevayî sîstema parastin û peywendiya leşkerî ya Îranê hatine bikaranîn.


Di heman demê de berdevkê Pentagonê Sean Parnell got ku di deh rojên pêşîn ên Operasyonê de û di encama êrişên berdewam de nêzîkî 140 leşkerên Amerîkî birîndar bûne. Parnell zêde kir ku piraniya van birîndaran birînên wan sivik bûn û destnîşan kir ku 108 leşkerên piştî wergirtina dermankirinê vegeriyane ser erkê xwe.

Di encama êrişan de Rêberê Bilind ê Îranê Elî Xamineyî û hejmarek ji berpirsên payebilind hatin kuştin, lê rêjîma ku ji sala 1979’an û vir ve li Îranê hikum dike hîn jî li ser kar e tevî qelsbûnê jî, artêşa Îranê bi berdewamî mûşek û dronan ber bi Îsraîl û welatên Kendavê ve diavêje.



**Hedefgirtina serokatiyê**

Di deqeyên destpêkê yên şer de, Îsraîlê hewl da ku rêza fermandariya Îranê asteng bike, ji ber vê yekê balafirên şer ên Îsraîlê bi mûşekan baregeha fermandariya Îranê li navenda Tehranê hedef girt, di wê demê de, berpirsên payebilind ên ewlehiya neteweyî ya Îranê li yek ji avahiyan dicivîn, di heman demê de Rêberê Bilind ê Îranê li avahiyek din bû. Xameneyî di nav wan kesên kuştî de bû û paşê Îsraîlê fermandarê payebilind ê Îranî yê berpirsiyarê operasyonên li Lubnanê li Tehranê şopand û kuşt.



**Dezgehên îstîxbarat û ewlehiyê**

Di bombebaranê de dezgehên ewlehî û îstîxbaratê yên berpirsiyarê tepeserkirina muxalefetê li Îranê jî bûn hedef, da ku hêza rêjîmê li ser desthilatdariyê qels bibe. Di nav hedefan de Pasdarên Şoreşê yên Îranê ku hêza leşkerî ya herî bihêz a welêt e herwiha hedefgirtina hêzên Besîc, milîsên bi cilên sivîl ên girêdayî Pasdarên Şoreşê.

Îsraîlê diyar kir ku wê di yek ji êrişan de bi dehan balafirên şer bikar anîn da ku li rojhilatê Tehranê baregehek bombebaran bikin ku baregehên fermandariya Besîc, Pasdarên Şoreşê û Hêza Quds, baskê berpirsiyarê operasyonên derveyî yên Pasdaran, lê bûn. Îsraîl texmîn dike ku di êrişan de bi sedan endamên Besîc û Padarên Şoreşê, ligel bi hezaran karmendên din ên ewlehiyê, hatine kuştin.

Wezareta Parastinê ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (Pentagon) ragihand ku wan cihên girêdayî Pasdarên Şoreşê bombebaran kirine, ji ber ku Pasdarên Şoreşê ligel hevalbendên xwe, di dehsalên borî de di gelek êrişan de Amerîkiyan hedef girtine. Herwiha Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê navendên binçavkirinê û avahiyên weşana televîzyon û medyayê jî hedef girtine.

**Mûşek û parastinên hewayî**

Beşa herî girîng a hemleya Amerîkî-Îsraîlê ew e hewldana sepandina serdestiya hewayî bû, bi rêya hedefgirtina berevaniya hewayî, depoyên mûşekan, platformên avêtinê û baregehên hewayî yên Îranê.

Artêşa Îsraîlê eşkere kiriye ku wan zêdetirî 300 pekandinên mûşekan ên Îranî û nêzîkî 150 sîstemên parastina hewayî bêbandor kirin û hîn jî moşekên balîstîk ên Îranî û cihên avêtina wan hedef digire. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî diyar kir ku wan hêza deryayî ya Îranê seqet kiriye, piştî ku 30 keştî tevî binavîyek, ji holê rakirine. Herwiha Artêşa Amerîkayê binavîyek bikar anî da ku torpîlekê bavêje û keştîyeke şer a Îranê li Okyanûsa Hindê binav bike.

Armanca operasyonên deryayî ew e ku şiyana Îranê ya tehdîdkirina li ser keştevaniyê li Tengava Hirmizê kêm bikin, ku nêzîkî pênc ji hinardekirina petrolê ya cîhanê û mîqdarên mezin ên gaza xwezayî ji wir derbas dibin.

**Bernameya Nûkleerî**

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîl biryardariya xwe ya ji bo pêşîgirtina li Îranê ji pêşxistina çekên atomî piştrast dikin. Di meha Hezêrana borî de, her du welatan li Îranê êriş pêk anîn ku Trump îdia kir ku şiyanên nukleerî yên welat “wêran kirine”, lê hêzên Amerîkî û Îsraîlê ji wê demê ve dîsa êrişî binesaziya nukleerî ya Îranê kirin, di nav de hedefgirtina avahiya Natanzê, ku Îran piraniya sotemeniya xwe ya nukleerî li wir hildiberîne.

Ew cihek a herî giring e ji bo bernameya nûkleerî ya Îranê tê hesibandin, wêneyên satelîtê nîşan didin ku êrişên nû deriyên şikefteke bin erdê li Natanzê ku tê de pergalên dewlemendkirina uranyûmê lê bûn, hilwişandin.

Lê hîn jî ne diyar e ka du tesîsên din, Esfehan û Fordo, ku di şerê 12 rojan de yê di navbera Îsraîl û Îranê de rastî êrişê hatin, dîsa hatine hedefgirtin an na. Herwiha Îsraîlê tesîseke veşartî ya bin erdê ya berê nenas li Minzadeh bakur-rojhilatê Tehranê hilwişand, ku diyar kir ew tesîs ji bo pêşxistina pêkhateyên çekek nukleerî dihat bikaranîn.

Balyozê Îsraîlê li Washingtonê, Yehiel Leiter got ku Îran “niyeta wê yekê heye ku uranyuma dewlemendkirî bi sîstema avêtina mûşekan re di nav wê kompleksê de bike yek.”

# Nakokiya di navbera aqilê dewletê û azadiya jinan de: Çima YPJ’ê nayê qebûlkirin?

Hasan Ağaç

Krîza îro li Rojhilata Navîn ne tenê meseleya sînor an desthilatdariyê ye. Aliyê herî kûr ê nakokiyên li herêmê di rastiyê de pevçûna zihniyetan e. Di dilê vê pevçûnê de yek ji mijarên herî girîng, pir caran nayên dîtin heye. Têkoşîna di navbera azadiya jinan û aqilê dewleta ku ji hêla mêran ve tê serdest kirin.Di vî warî de, şoreşa Rojava di dîroka Rojhilata Navîn de şikestinek bêhempa çêkir. Ji ber ku cara yekem, pergalek civakî ne tenê li ser îdîayek etnîkî an neteweyî ya rizgariyê, lê di heman demê de li ser modelek siyasî ku li ser rizgariya jinan disekine jî hate avakirin.

Ji ber vê yekê derketina holê ya YPJ ne tenê pêşveçûnek leşkerî ye. Yekîneyên Parastina Jinan dijwariyek dîrokî ne ku li dijî fermana şer a hezar salî ya ku ji hêla mêran ve tê serdest kirin çêbûye.

Ji ber vê sedemê, ji bo hêzên mîna rejîma Şamê û HTŞ, hebûna YPJ’ê ne tenê pirsgirêkek leşkerî ye. Ji bo wan, meseleya rastîn ew e ku jin bûne mijarên çekdar û rêxistinkirî. Fêmkirina klasîk a dewletê li Rojhilata Navîn li ser modelek yekane ye. Yek navend, yek artêş, yek desthilatdarî.Di vê modelê de, civak ji jor ve tê birêvebirin û hêz di dewletê de kom dibe. Jin, di vê pergalê de, pir caran ji jiyana civakî têne dûrxistin. Ji ber vê yekê, derketina holê ya jinan wekî aktorên leşkerî û siyasî ji bo vê aqilê dewletê dijwar e ku qebûl bike. Lêbelê, ezmûna Rojava ev aqil berevajî kir.

Modelek derket holê ku jin bi rêya pergala hevserokatiyê di siyasetê de têne temsîl kirin, civak bi rêya encumenên herêmî tê organîze kirin, û parastina xwe ne tenê ya mêran e, lê di heman demê de ya jinan e jî. Hebûna YPJ’ê sembola herî berbiçav a vê modelê ye.

Rola ku şervanên YPJ di şerê li dijî DAIŞê de lîstin ne tenê serkeftinek leşkerî bû; ew di heman demê de darbeyek mezin li bîrdoziya serdest a mêran li Rojhilata Navîn temsîl dikir. Têkçûna rêxistinek tarî wekî DAIŞê ji hêla jinan ve bandorek mezin li ser raya giştî ya cîhanê kir. Ji ber ku ev têkoşîn ne tenê li dijî rêxistineke terorîst bû, lê di heman demê de li dijî zîhniyeta ku jinan kole dike jî bû.

Ev bi temamî sedema sereke ye ku YPJ îro nayê qebûlkirin. Rejîma Şamê û hêzên bi vî rengî dixwazin pergala xweparastinê ya Rojava ji holê rakin. Ji ber ku di nav mentiqa dewleta neteweyî ya navendî de, avahiyên leşkerî û civakî yên cûda nayên qebûlkirin. Ji ber vê yekê, têgeha “artêşeke yekane” tê ferzkirin.

Lêbelê, ji bo Rojava, pirsgirêk ne tenê mijara avahiya leşkerî ye. YPJ temsîla îradeya jinan a ji bo azadiyê ye. Mafê xweparastinê yê jinan yek ji prensîbên bingehîn ên pergala civakî ya li Rojava ye. Ji ber vê yekê, dev ji vê avahiyê berdan ne tenê paşvekişîna leşkerî lê di heman demê de paşvekişîna ji şoreşa civakî jî tê wateya, Paradîgmaya rizgariya jinan a ku ji hêla Rêber Apo ve hatî pêşxistin di vê nuqteyê de rolek diyarker dilîze. Rêber Apo rizgariya jinan ne tenê wekî mijarek reforma civakî, lê di heman demê de wekî pirsgirêkek rizgariya bingehîn di dîroka mirovahiyê de dihesiband. Li gorî wî, pergala ku ji hêla mêran ve serdest e ne tenê jinan lê tevahiya civakê kole dike.

Ji ber vê yekê, demokrasiyeke rastîn û civakeke azad bêyî bidestxistina azadiya jinan ne mimkûn e.

Ezmûna Rojava wekî îfadeyeke pratîkî ya vê perspektîfê derket holê. Rola pêşeng a jinan di warên leşkerî, siyasî û civakî de deriyê serdemeke dîrokî ya nû li Rojhilata Navîn vekir. Ji ber vê yekê ye ku ev model îro nayê qebûlkirin.

Ji ber ku ev model xwedî potansiyel e ku ne tenê herêmekê, lê tevahiya rêziknameya siyasî ya Rojhilata Navîn bipirse. Hebûna YPJ nîşan dide ku jin ne tenê dikarin bibin qurbaniyên şer, lê di heman demê de hêza damezrîner a jiyaneke azad jî. Ji ber vê yekê, nakokiya herî mezin li Rojhilata Navîn ne di navbera dewletan de ye, lê di navbera du modelên civakî yên cuda de ye.

Li aliyekî sîstema otorîter û serdest a mêran a dewleta navendî heye. Li aliyê din modela civaka demokratîk a li ser bingeha azadiya jinan heye.

Ev nakokî ne tenê pêşeroja Rojava, lê di heman demê de pêşeroja Rojhilata Navîn jî diyar dike.

Ji ber ku di bingeha krîzên ku bi sedsalan li Rojhilata Navîn dom kirine de ne tenê sînor hene, lê di heman demê de ev pirsgirêka zîhniyetê jî heye.

Rastiya ku civakek ku jin tê de azad nebin nikare azad be îro careke din li Rojava derketiye holê. Ji ber vê yekê, hebûna YPJ’ê ne tenê hêzek leşkerî ye, lê pirsek e ku li ser pêşeroja Rojhilata Navîn e.

Gelo Rojhilata Navîn dê bi rêziknameya kevn a serdestiya mêran berdewam bike, an dê rêyek civakî ya nû ya ku bi azadiya jinan ve hatî vekirin derkeve holê? Bersiva vê pirsê dê ne tenê çarenûsa Rojava, lê wê ya tevahiya herêmê diyar bike.

# Daniyal Horo: Cejna Newrozê cejneke netewî ye

Berçem Silêman/ Dêrik

**Terzî Daniyal Horo diyar kir ku cejna Newrozê cejneke netewî ye û her sal heyecana gel ji bo pêşwaziya wê zêdetir dibe, lê îsal şert û mercên ku herêm têre derbas dibe cûdaye, lewma amadekarî ji bo wê kêmin.**

Cejna Newrozê, cejneke çandî û dîrokî ye ku ji aliyê gelê kurd û gelek gelên din ên herêmê ve her sal di meha Adarê de li seranserî cihanê tê pîrozkirin. Di serdema nûjen de cejna Newrozê di çanda kurdan de wekî cejna azadî û vejînê ye her sal di 21’ê Adarê de li seranserî Kurdistanê tê pîrozkirin.

Di derbarê amadekariyên cejna newrozê û moralê gel de îsal ji bo pêşwazî kirina wê terzî Daniyal Horo ji Rojnameya me re axivî.



## Erkê terzî derxistina rengê newrozê ye

Daniyal Horo da zanîn ku cejna Newrozê salên borî bi heyecantir bû ji îsal û wiha got: “Salên derbas bûyê her terziyek nêzî 150 cil û bergên kurdî di nav destê wan de hebûn û berî cejnê bi 15 rojan derfet li cem me nedima ku em cawên nû bigrin dest. Lê îsal heya niha jî em cawan digrin dest û gelek valehî li cem me heye, êrişên ku li ser gelê kurd pêk hatî bû sedema bê moralbûna gel ji pêşwaziya newrozê re. Her wiha ew nakokî li cem gel derket gelo piştî van şert û mercên heyî wê cejna newrozê were pîroz kirin yan na, lewma amadekariyên wan ji bo vê yekê gelekî kêm bûn. Her mirovek erkî wî heye di cejna newrozê de erkê me jî wek terzî derxistina rengê newrozê bi riya cil û bergên kurdî ye, lê sedema rewşa heyî me gelek astengî dîtin.”

## Gelê kurd dev ji rê û resmên xwe bernadin



Terzî Daniyal Horo axaftinên xwe bidawî kir wiha got: “Ez ji 12 saliya xwe ve karê terziyê dikim lê piştî şoreşa sûrî dest pê kir êdî min dest bi çêkirina cil û bergên kurdî kir. Her sal derbas dibû me cihê xwe di Newrozê de digirt. Cejna Newrozê ji bo gelê kurd sembola azadî û nûjeniyê ye, lewma gelê kurd dev ji hertiştî berde dev ji cejna netewî bernadin. Dema em 18’ê Adara sala 2018’an ji Efrînê koçber bûn tevî wilo jî di 21‘ê Adarê de me cejna newrozê bi coş pîroz kir. Lewma bila cîhan bizanibe ku gelê kurd dev ji rê û resmên xwe bernadin û çi dibe bila bibe em ê agirê kawayê hesinkar pê bixin. Em bi hêvîne ku nêzîktirîn dem de em vegerin Efrînê û rengê ku ez li vir didim ez li wir jî bidim û newrozê li Efrînê jî bixemilînin û vejîn bikim. Çiqasî mirov newrozê pîroz bike jî lê ne li ser axa xwe be çêja wê nîne lewma em di wê heyecanê de ne ku em îsal newroza xwe li Efrînê pîroz bikin.”



# Salih Muslim... şopa xwe di dîroka siyaseta Kurdî de hiştiye

Di 11'ê Adarê de yek ji siyasetmedarên Kurd Salih Muslim di encama nexweşiyê de gihatşt asta şehadetê. Ew yek ji kesayetiyên herî berbiçav bû ku di deh salên dawî de roleke bi bandor di şekildana gotara siyasî ya Kurdî de lîst, herwiha navê wî bi ezmûnên siyasî û rêxistinî ve girêdayî ye ku bandorek eşkere li ser rêça doza Kurdî kiriye.

Hêvî Keleş/ Qamişlo

Şehadeta pêşengê Kurd di nav derdorên siyasî yên Kurd û Sûrî de bûyerek girîng e, ji ber rola wî ya berbiçav a ku wî bi salan di xebata siyasî û rêxistinî de lîstiye. Siyasetmedarê ku jiyana xwe li gundekî yê Kurdî li Kobanê dest pê kir, bi salan karî bibe yek ji kesayetiyên siyasî yên Kurd ên herî navdar û bibe beşek ji veguherînên mezin ên ku welat di dehsalên borî de şahidî kiriye. Navê wî bi pêşketinên tevgera siyasî ya Kurdî û bi kêliyên girîng ên ku li Sûriye û herêmê qewimîne ve girêdayî ye, ji çalakiya siyasî ya Kurdî di salên 1970’î de dest pê kir û heta qonaxa veguherînên mezin ên ku bi belavbûnê û guhertinên paşê di hevsengiya hêzê ya welêt de pêkhatin.

## Jiyana destpêkê

Ew di sala 1951’ê de li bajarê Kobanê ku yek ji bajarên navdar ên Kurdan e, ji dayik bûye. Ew di hawîrdoreke gundewarî ya sade de mezin bûye, civaka wî bi giranî xwe dispêre çandinî û keda destan û nasnameya çandî ya Kurdî di jiyana rojane ya niştecihan de bi xurtî hebû. Di wê hawîrdorê de bû ku hişmendiya wî ya destpêkê ya li ser pirsgirêkên civaka xwe çêbû, ji ber ku nîqaşên li ser nasnameya Kurd û mafên çandî û siyasî beşek ji jiyana giştî ya herêmê bûn. Vê atmosferê bandorek eşkere li ser kesayetiya wî kir û paşê ew ber bi siyaset û xizmeta giştî ve bir.

## Salên xwendinê û destpêka hişmendiya siyasî

Piştî qedandina lîseyê, Muslim ji bo xwendina endezyariya kîmyewî li zanîngehê qeyd bû. Di dema xwendina xwe de, eleqeya wî bi mijarên siyasî re zêde bû, nemaze ji ber nîqaşên di navbera xwendekaran de li ser azadî, edaleta civakî û mafên gelan. Ew serdem di şekildana meyla wî ya siyasî de girîng bû, ji ber ku ew bi ramana siyasî ya Kurd re nas bû û dest bi nêzîkbûna çalakiyên bi tevgera Kurdî re kir.

Bi demê re, ew bû beşek ji toreke çalakvanên siyasî yên Kurd ku dixwestin hişmendiya neteweyî pêşve bibin û mafên çandî û siyasî yên Kurdan di nav Sûriyê de biparêzin.

## Tevlîbûna çalakiyên siyasî

Di salên 1970 û 1980’î de, beşdarî çalakiyên rêxistinî û siyasî yên ku armanca wan parastina mafên Kurdan û xurtkirina hebûna tevgera siyasî ya Kurd bû, bû. Lê belê, çalakiya siyasî di wê serdemê de ne hêsan bû, ji ber ku tevgerên siyasî yên Kurd rastî zextek mezin dihatin. Carinan, Muslim neçar ma ku welêt biterikîne û li derveyî welêt bixebite, li wir bi çalakvanên Kurd re têkilî daynin û beşdarî çalakiyên siyasî yên têkildarî doza Kurd bibin. Tevî dijwarîyan jî, ew karîbû hebûna xwe di nav çerxên siyasî yên Kurdî de bi cih bike û toreke fireh ji têkiliyên siyasî û rêxistinî ava bike.

## Damezrandina Partiya Yekîtiya Demokratî

Di sala 2003’an de, navê Muslim bi damezrandina Partiya Yekîtiya Demokratî, ku yek ji partiyên siyasî yên Kurd ên wê demê derket holê, bêtir derket pêş. Ew di nav kesayetiyên ku di avakirin û organîzekirina partiyê de roleke girîng lîstin de bû. Paşê, wî serokatiya partiyê girt ser xwe û bû yek ji rêberên wê yên herî navdar, li wir wî ji bo berfirehkirina çalakiyên wê yên siyasî û rêxistinkirina refên wê li herêmên Kurdî xebitî.




Di wê demê de, partiyê bal kişand ser pêşkêşkirina ramanên têkildarî demokrasî, nenavendîkirin û mafên pêkhateyên cûda yên li Sûriyê.

## Rola wî piştî krîza Sûriyê

Bi destpêkirina krîza Sûriyê re, Sûriye ket qonaxek nû ya veguherînên siyasî û leşkerî. Di vê heyamê de, navê Muslim derket pêş, ji ber ku ew bû yek ji kesayetiyên siyasî yên Kurd ên herî navdar ku li ser navê tevgera siyasî ya Kurd li Sûriyê diaxivî. Navê wî bi ceribandina Rêveberiya Xweser li Bakurê û Rojhilatê Sûriyê ve girêdayî bû, ceribandineke siyasî ku armanc dikir di salên şer de deverên Kurdî û herêmên din bi rê ve bibe. Herwiha beşdarî gelek civînên siyasî û diyalogên navneteweyî bû, ku tê de hewl da vîzyona tevgera siyasî ya Kurdî derbarê pêşeroja Sûriyê û rêyên çareserkirina krîza siyasî ya ku welat tê re derbas dibe, vebêje.

## Çalakiyên wî yên siyasî û dîplomatîk?

Rola Muslim ne tenê bi xebata partî û rêxistinî ve sînordar bû, lê di heman demê de berfirehî çalakiyên siyasî û dîplomatîk jî kir. Ew beşdarî konferansên navneteweyî û civînên siyasî yên bi kesayet û rayedarên welatên cûrbecûr re bû, di heman demê de di gelek nîqaşên derbarê pêşeroja Sûriyê de amade bû. Di wan hevdîtinan de, wî bal kişand ser pêşkêşkirina vîzyonek siyasî li ser bingeha nenavendîkirina siyasî û naskirina cihêrengiya neteweyî û çandî di nav welêt de. Herwiha tekezî li ser girîngiya dîtina çareseriyên siyasî ji bo krîza Sûriyeyê kir ku beşdariya hemû pêkhateyan di birêvebirina welêt de garantî bike.

## Di navbera piştgirî û rexnekirinê de

Wekî gelek kesayetên siyasî yên bi bandor, kariyera Muslim bê nakokî û rexneyan derbas nebûye. Ew rastî rexneyên hin hêzên siyasî yên ku bi helwest an polîtîkayên partiya wî razî nebûn, hatiye. Ji aliyekî din ve, alîgirên wî bawer dikin ku wî di yek ji serdemên herî aloz ên dîroka Sûriyeyê de roleke girîng di organîzekirina çalakiya siyasî ya Kurd de lîstiye û ku ew beşdarî ronîkirina pirsgirêka Kurdî li ser qada siyasî ya herêmî û navneteweyî kiriye. Di navbera piştgirî û rexneyan de, navê wî yek ji navên herî berbiçav di qada siyasî ya Kurdî de ma.

## Mîrateyeke siyasî ya mayînde

Bi koça dawî ya wî re, qada siyasî ya Kurd kesayetiyek winda kir ku di dehsalên borî de di rêça wê de roleke girîng lîstiye. Ew di gelek qonaxên siyasî yên girîng de amade bû û beşek yekgirtî ya serdema veguherînê di dîroka Sûriye û herêmê de bû.

Navê Salih Muslim dê di bîra siyaseta Kurd a hemdem de bimîne, wekî yek ji kesayetên ku beşdarî şekildana rêça tevgera siyasî ya Kurd li Sûriyê bûye. Ev mêrê ku jiyana xwe li gundekî biçûk li Rojavayê Kurdistanê dest pê kir, karîbû bibe yek ji kesayetiyên siyasî yên herî girîng ên herêmê û şopek zelal li ser dîroka doza Kurd a hemdem bihêle. Bi koça wî ya dawî, biyografiya wî hîn jî beşek ji dîrokeke dirêj a têkoşîna siyasî ye ku ji aliyê tevgera Kurdî ve ji bo bidestxistina naskirina maf û statuya xwe di çarçoveya siyasî ya Sûriyeyê de hatiye meşandin.

# ‘Koçberên Serêkaniyê bendewar in rêkeftina 29’ê Çileyê deriyê vegera biewle veke’

Koordînasyona Ragihandinê ya Komîteya Koçberên Serêkaniyê Dilo Mihemed Elî diyar kir ku her çendî şert û mercên jiyana koçberiyê gelek dijwar be jî, lê ew hêvî di dilê koçberên Serêkaniyê de hîn heye ku rojekê vegerin ser mal û milkên xwe û got, “koçberên Serêkaniyê bendewar in ku rêkeftina 29’ê Çile deriyê vegera bi rûmet û ewle ji bo wan veke.”

**Ronahî Sadûn**

Sala 2018 û 2019’an birîneke êşê di dilê xelkê Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî û gundewarên wan de vekir ku ev bajar ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatin dagirkirin. Dagirkerî bû sedema koçberiya zorê ya şêniyên resen ên van deveran ku heya roja îro, ev koçber êşa koçberiyê dişkînin. Ne tenê mal û milkên koçberên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji wan hat dizîn, lê xweza hat talankirin, erdnîgariya herêmê hate guhertin û gelek sûcên kuştinê li wir pêk hatin û hîna jî pêk tên. Koçberên van deveran heya roja îro bi berxwedanî, sebir û rêya vegera malê jiyan dikin. Guhertinên ku sala 2024’an li Sûriyê pêk hatin bi hilweşîna rejîma Baas û avakirina hikumeteke demkî ji bo birêvebirina welêt di qonaxeke veguhêz a hesas de, Sûriye şahidiya guhertineke siyasî ya mezin kir. Wê demê, gelek Sûrî bawer dikirin ku ev gav dê deriyê serdemeke nû ya çareseriyên siyasî û vegera gav bi gav a kesên koçber bo malên xwe veke. Lêbelê, rastiyên li ser erdê zû eşkere kirin ku rêya vegera wisa, ne hêsan bû. Herêmên ku ji hêla dewleta Tirk û komên girêdayî wê ve hatine dagirkirin, rewşeke ewlehî û siyasî ya tevlihev dijîn, raporên mafên mirovan, binpêkirin û kêmasiyên ewlehiyê yên vê yekê jî belge kirine. Hem jî tevî îmzekirina gelek lihevkirina jî lê vegera koçberan pêk nehat.

Herî dawî di 29’ê Çileyê de peymaneke siyasî ya girîng di navbera hikumeta demkî ya Sûriyê û Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê (QSD) de derket pêk hat. Her du aliyan peymaneke agirbestê ya berfireh û têgihîştineke li ser entegrekirina qonax bi qonax a hêzên xwe yên leşkerî û îdarî ragihandin. Di nava vê peymanê de vegera kesên koçber wekî xaleke sereke ye. Niha jî piştî pêkanîna hin benda, li ser bendê koçberan jî xebat tê kirin ku di çarçoveya wê de jî hin ji malbatên Efrîn çûn bajarê xwe. Koçberên Serêkaniyê ew jî amadekariyê vegera xwe kirine, tenê li benda biryarê ne, da ku hesreta wan a salane ku bajarê xwe hembêz bikin. Lê şertê bingehîn ên vegera van koçberan garantîkirina ewlehiyê û rûmetiyê ye. Ji bo bi hezaran malbatên ku bi salan e li kampên koçberan dijîn, vegera malê ronahiyek hêviyê ya dirêj û bendeware. Van malbatan bi salan di şert û mercên dijwar de tehemûl kirine û di konên hilweşiyayî de bi alîkariya mirovî ya sînorkirî dijîn, tenê ji bo vê rojê “Roja vegerê bibînin”.



Derbarê rewşa koçberên Serêkaniyê, herwiha xebatên ji bo vegera biewle ya koçberan, koordînasyona Ragihandinê ya Komîteya Koçberên Serêkaniyê Dilo Mihemed Elî ji rojnameya me re axivî.

**‘Êşa 7 salan di nava seatan de nayê vegotin’**

Dilo Elî rewşa koçberên Serêkaniyê û jiyana wan di Kampan de anî ziman ku ew bi gelek zehmetiyan re rûbirû ne û wiha got: “Piştî dagirkirin bajarê Serêkaniyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, xelkên Serêkaniyê neçar bûn ku ji bajarê xwe derkevin û li deverên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bicîh bibin. Îro jî ew ji Dêrikê heya bajarê Hesekê jiyan dikin. Berê hinek ji wan li bajarê Reqa jî hebûn, paşê ji Reqa hatin. Rewşa koçberan pir dijwar û zehmet e. Herwiha êşa 7 salan di heyama çend seatan de nayê vegotin. Ji ber ew êş û zehmetiya ku xelkên Serêkaniyê di van salan de dîtine, pir mezin e. Niha gelek ji wan li kampan dijîn, wek Kampa Serêkaniyê û Kampa Waşûkanî li bajarê Hesekê, di heman demê de Kampa Newroz li bajarê Dêrikê. Di van kampan de xelkê me bi şert û mercên gelek dijwar rerûbi rû ne. Di salên berê di dema rejîma Baas de, tu erêkirineke fermî ji bo kampên koçberan ên Serêkaniyê nehat kirin. Mixabin alîkarî jî gelek kêm bû. Heta niha jî tu erêkirina fermî nehatiye kirin, ne ji aliyê hikumeta berê û ne jî ji aliyê hikumeta demkî ya niha ve. Lê her çendî şert û mercên jiyanê gelek dijwar bin jî, hêvî di dilê xelkê Serêkaniyê de hîn jî heye. Ew hêvî dikin ku rojekê vegerin ser mal û milkên xwe. Gelek kes çavê xwe li rêkeftina 29’ê Çileyê kirine, bi hêvîya ku ev rêkeftin rê li ber vegera wan veke. Ji ber jiyana rojane di kampan de gelek zehmet e. Hem jî ne zivistana wan zivistan e û ne jî havîna wan havîn e.Dema havîn tê, germahî pir zêde dibe û ew kon nikarin ne te, ne zarokên te û ne jî malbata te ji germahiya rojê biparêzin. Dema zivistan jî tê, zivistan gelek xurt e û ew kon nikarin te ji serm û seqemê biparêzin. Mixabin, di 6 salan de ev kon nehatin guhertin. Mirov e ku di heftiyê de çend caran cilên xwe diguherîne, lê 6 sal derbas bûn û konên kampan hîn jî nehatin guhertin. Ev tiştekî ne hindeke ji bo xelkên li kampê.”

**‘Koçberên Serêkaniyê tevî dilşiketinê, hêviya vegerê dijîn’**

Dilo tekez kir ku di nava van salên koçberiyê de, ji bo koçberên Serêkaniyê alîkariyeke pir kêm hat pêşkêşkirin û wiha bilêv kir: “Ji bo alîkariya koçberên Serêkaniyê, alîkariyeke gelekî kêm hat pêşkêş kirin, hem ji aliyê Rêveberiya Xweser ve, hem ji aliyê rejîma Baas û ji xwe hikumeta demkî ya niha ya Sûriyê ve me tiştek nedîtiye. Lê em bi wê hêviyê ne ku lihevkirin biçe serî, da ku koçber vegerin ser mal û milkên xwe. Heta niha gelek ji koçberên Serêkaniyê di hundirê mala de jiyan dikin û piraniya wan di malên kirê de ne. Mixabin tu alîkariyeke girîng bi wan re nehat kirin ku barê wan kêm bibe, mînak pêwîst bû ku mehane pakêtên xwarinê, herwiha alîkariyên madî û manewî pêşkêş bikin. Lê ev tişt pêk nehat. Koçberên Serêkaniyê heta niha dilşikestî ne, lê dîsa jî bi hêviya vegerê dijîn.”

**‘Me dest bi tomarkirina navan ji bo vegera biewle kiriye’**

Dilo eşkere kir ku ew ji bo vegereke biewle dixebitin û wiha anî ziman: “Em Komîteya Koçberên Serêkaniyê ev demeke ji me hat xwesetin ku em dest bi tomarkirina navên hemwelatiyên xwe bikine. Armanca vê yekê ew e ku bîlançoya koçberên Serêkaniyê were amadekirin. Ji ber vê yekê, em bang li hemû xelkê Serêkaniyê dikin ku niha li ku derê bin ji Dêrikê heta Hesekê, li Dirbêsiyê, Amûdê û deverên din xwe qeyd bikin. Ev qeyd ji bo amadebûna vegera me ser mal, milk û axa xwe, bi awayekî rûmet û bi ewlehî tê kirin. Herwiha em wek komîte soz didin ku her tiştê ji destê me derkeve ji bo xizmeta xelkê Serêkaniyê, em ê bikin. Dema me bi çavên xwe dît ku çawa xelkê me yê Efrînê vegeriyan ser mal û milkên xwe û li erebeyan siwar hatin. Ev dîmen ji me re hêvîyek mezin çêkir. Em wek xelkê Serêkaniyê jî bi hisreta wê rojê dijîn, roja ku em jî dîsa vegerin ser mal û warê xwe û ser axa xwe. Em bi gelê xwe yê Efrînê re hestek hevpar hildigirin, ji ber ku me jî êşa koçberiyê dîtiye. Gotinek heye ku dibêje: “Kes êşa xwedî nizane, ji xwediyê êşê pê ve.” Bi vê hêviyê em dijîn ku rojekê nêzîk ev roj pêk bê û hemû koçber dîsa vegerin ser ax û mal xwe bi rûmet û azadiyê.”

**‘Vegera malê wê hemû êşên salên koçberiyê bide jibîrkirin’**

Dilo axaftina xwe wiha bidawî kir: “Êşa koçberan gelekî giran e. Ji aliyê tenduristiyê ve gelek zehmetî hene û di warê xizmetguzariyê de jî kêmasîyên mezin hene. Ji ber ku kamp bi awayekî bingehîn nehatiye amadekirin, tu binesazî û bingehên jiyanê jêr nehatiye danîn, tenê kon hene û mirov di wan de dijîn. Bi vî awayî jiyan pir zehmet e. Bi taybetî di aliyê tenduristiyê de xelk gelek zor û zehmetiyan dibînin. Tevî ku Kampa Holê û Erşa berê ew jî ne fermî hatibûn qebûlkirin, li 72 rêxistin tê de dixebitîn, lê ya Serêkaniyê tenê 3 rêxistinên xwecihî ne, yek du jê jî ne hikumî ne, lewra zimeta wê jî pir lewaz û kêm bû. Di nav wan de Heyva Sor a Kurd û ERS jî xalên tenduristiyê hebûn. Lê bi giştî di kampê de nêzîkî 15 hezar kes dijîn û tenê du xalên tenduristiyê hene, ev jî bi tu awayî têr nake. Di nav koçberan de nexweşiyên giran, wekî pençeşêrê, jî hene. Herwiha gelek zarokên biçûk hene. Nêzîkî 7 hezar zarok di kampê de dijîn û ew zarok pêdiviya wan bi baldariya tenduristî, baldariya malbatê, xwendin û gelek tiştên din heye. Lê mixabin ev hemû xizmet di kampê de gelek lewaz in. Ji ber vê yekê rewşa koçberên Serêkaniyê di hundirê kampê de gelek zehmet e. Ew kesên ku li derveyî kampê di malan de dijîn de jî bi pirsgirêkên mezin re rûbirû ne, kirêya malan bi dolar tê xwestin û xwediyên malan jî her çend mehan carekê kirêyê bilindtir dikin. Lê koçber nikarin ev pereyên bilind bidin û ji ber vê yekê gelek caran bêçar dibin ku ji malan derkevin. Mixabin, heta niha jî koçberên Serêkaniyê gelek zehmetiyan di mijara kiryên malan de dikşînin. Derfetên kar ji wan re gelek kêm bûn, ji ber ew hewcedarî kar bûn ku rêveberîyan yan jî kesên din ji wan re kar bidîtana, lê ev yek nebû. Dîsa jî em bendewar in, lihevkirin her serî û vegerin malên xwe, ji ber ku dema ku em her cih û warê xwe, em zor û zehmetiyên 7 salên koçberiyê ji bîr bikin û wekî ku em nû ji dayikên xwe re çêdibin.”

Hêjayî gotinê ye ku tê payînkirin wê rêya Serêkaniyê û Girê Spî were vekirin, koçberên van bajaran bi awayekî rûmet û ewle vegerin warên xwe.

**FENER**



**Idrîs Henan**

## Guhertinên Herêmî û Vegera Şêniyên Efrînê Di Hesabên Jeopolîtîk û Îradeya Gelan De

Ezmûna kirîza li herêmê aşkare kir ku; hevpeymanên li Rojhilata Navîn kêmcaran demdirêj dibin. Timî li gorî mentelîteyek pragmatîst di bin sîwana berjewendiyên stratejîk ên hêzên hegemoniyê de tên vesazkirin. Ne li gorî armnacên hêz û tevgerên herêmî ne, lê di bin serweriya hevsengiyên ku hêza global ferz dike û hewcedariya enerjî û hegemoniyê de tên rêsandin. Ji lew re, mirov nikare rewşa heyî derveyî toreya berjewendiya navdewletî ku rêyên buyeran tayîn dikin û hevpeymanan li dûrî pêşbîniyên kirdeyên herêmî ava dikin, şîrove bike.
Di vê navberê de hebûna Kurdan li herêmê ji nû ve weke diyardeyeke jeopolîtîk û potansiyelek bandorê li şiklê hevsengiya li Rojhilata Navîn dike, derdikeve.
Ezmûnên berê li herêmê ispat dikin ku kîjan hêza herêmî ya pala xwe dabe hevbendiyên navdewletî, rûbirûyî veguherînên ji nişkêve ye. Berjewendiyên navdewletî li gorî ejandayên stratejîk zû tên guhertin. Ezmûna tevgera Kurd jî ew yek weke hişmendî li ser liv û tevgera wê ferz kiriye ku divê di heyamekî wisa tevlihev de, bi baldarî hevbendiyên xwe ava bikin û da ku kêmasiyên berê dubare nabin, divê dîplomasî û siyaseta xwe xortir bikin ku nebin terefê lawaz a aloziyê.
Di heman xala avakirina hevpeymanan de, di mesela Sûriyê piştî peymana 29 Çileya îsal de, mirov dikare bi zelalî bandora wê yekê li şiklê pratîzekirina xalên wê peymanê bi zelalî bibîne. Yek ji xalên wê yên gelek bi bandor jî ew bû, xala vegera koçberan ku bi pêla yekem a vegera Efrîniyan re dest pê kir. Dosyaya herî kirîtîk di aloziya Sûriyê de, vegera koçberên Efrînê bû. Di vê çarçoveya peymana ku li gorî hevpeymanên nû hatibûn îmzekirin de, piştî heşt salan ji derbiderî û koçberiyê, vegera gelê Efrînê pêşketinek gelek girîng û gavek stratejîk bû.
Efrîn di êrişa dewleta Tirk û çeteyên wê sala 2018’an de hatibû dagirkirin û bi deh hezaran şêniyên wê yên resen bi zorê hatin koçberkirin. Her kes dizane jî, ku ne ji hêza berjewendiyên qonaxê bûya, îmkan nîn bû ku dewleta Tirk gava vegera şêniyan qebûl bike. Ji ber vê yekê; dibe ku vegera şêniyên Efrînê weke gaveke mirovî hatibe xuyakirin, lê di cewher de hesabên mekan û zeman derbas dike û vegerek li rih, nasname û dîrokê ye. Di heman demê de dîplomasî û şiklê siyaseta nû ya li herêmê û têgihaştina motîvasyona jeopolîtîk a rola kirdar a Kurdan di herêmê de ye.
Ji ber vê zanînê em nikarin vegerê weke vegerandina mal û zeviyekî pênase bikin. Lê belê hewleke ji nû ve çêkirin û hevdengkirina tevna civakî ye ku di dirêjahiya salên derbiderbûnê de ziyanek mezin lê bibû. Her wiha nameyek siyasî a zelal e ku îradeya şêniyên resen dikare li hemberî hemû projeyên biyanî yên dixwazin heqîqetê biguherin, têbikoşe û biserkeve. Ragiriya şêniyên Efrînê ew yek jî aliyê pratîk ve tivî kiriye û gotiye; parastina ax û nasnameyê dikare bibe faktorekî diyarker li hemberî hewldanên guherandina demografîk û sedemeke serkeftinê. Ev yek jî bi tablo û dîmenên vegera birûmet û hembêzkirina gel ji hev re xwe da der.
Di encamê de; pêşketinên li ser erdê ku şiklê hevpeymaniyan guhertiye, heqîqetek bi xwe re derxistiye, ew jî tê wê wateyê ku aqûbeta nakokî û hevbendiyan ne tenê bi vîna hêrêmî tê destnîşankirin, lê belê bi hevgirtina berjewendiyên navneteweyî û herêmî ve şikil digire. Digel vê yekê jî, îradeya gelan û girêdana wan bi axê û nasnameya xwe re, şiklê hevbendiyê çi dibe bila bibe, faktorekî nayê înkarkirin û rola sereke û bi bandor di şikldana pêşeroja li herêmê û hevpeymanan de dilîze ku aktorekî hevsengiya jeopolîtîk e.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Kemal Necim ew bejnek wêjeyî ya bilind û Stûnek ramyarî qet naçime ye. Ew bi rêya helbestên xwe, rêçikên hişmendiya neteweyî û têkoşîna çandî ronî dike, hem jî tekez dike ku peyva afrîner hêza wê heye da ku nasnameyê biparêze û pêşerojek geş ava bike.
Helbestvan û nivîskarên Kurd di Tevgera Rizgariya Kurdî de rolek girîng lîstin, herwiha rolek berçav dihişiyariya ramanê neteweyî û parastina nasname û zimanê Kurdî de lehîstine, di demeka ku peyv hatibû dorpêçkirin, tîp hatibû darezandinû vegotina çandî û ramanê azad jî bi asteng û şopandinê re rûberû mabû ,ew bibûn parêzvanên bîranîna çandî, xetîreya çandê hilgirtin û wekî çekekî bi kar dianîn da ku hebûna Kurdî û nasnameya wê biparêzin, li dijî hemû hewldanên ku di xwestin nasnameya neteweyî û çandî ya gelê Kurd bin pê bikin û ji holê rakin.
Helbestvanê Kurd Kemal Necim yek ji van helbestvanên hemdem e ku barê peyv û xewna azadiyê hilgirtibûnû xîmava pênûsên xwe kirbûn di xizmeta gelê xwe û doza wî de,wî bi rêya karên xwe yên wêjeyî, hevbexşiyek kir di navbera helbest û ramanê de û nivîsarên xwe kir mîna neynikek ji bo derbirîna êş û derdên welatê xwe û pencerek vekirî ji bo azadî û rûmetê.
Kemal Necim di sala1969’an de ji dayîk û bavek Kurd (Ebdulla û Payîz), li bajarokê Girkê Legê, yê girêdayî herêma Dêrikê li Rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê, ew xaka ku di dirêjahiya dîrokê de bûyî dîdargeh ji bo olên asmanî û dergûşek ji bo biratiyê di navbera pêkhateyên Kurdî, Erebî û Sûryanî de,ji ber vê yekê, Dêrik bûye mîna tabloyek taybet a cihê cudaîtiyê û hevjiyana hevbeş di navbera ol û ayînan de, Dêrik, bi mîrateya xwe ya çandî û giyanî ku tê nasîn , ew bûye feraşînek ji bo helbestvan û nivîskarên Kurd mîna Omar Le‘lî, Ehmed Şêx Saleh, Lorî Tildarîû şehîd Rizgar, Elî Çil axa û xeynî wan yên ku wêjeya Kurdî ronî bi tîpên xwe yên bedew û gotinên xwe yên şêrîn.
Kemal Necim di himbêza malbateke Kurd a welatparêz û kedkar de, ku girêdayî bi kokên xwe û nirxên Kurdî yên resen ve, di nav malbateke mezin ku ji sêzdeh zarokên pêk tê (heft bira û şeş xwişk) mezen bûye, ew hatine firşik kirin li ser hezkirina xakê û dilsoziya ji bo welat.
Wî zaroktiya xwe ya yekem li kolanên Girkê Legê ên kevnare û taxên wê ên gelêrî û di nav zeviyên wê de yên ku bêhna genimê zêrîn û axa tije bi rûhê neteweyî jê difûre derbaskir, li wir nîşanên zaroktiya wî hate avakirin û gava xwe ya yekem ber bi dibistanê ve avêt e, di destê xwe de defterên tîpan hildigire û di dilê xwe de tovê xewna Kurdî diçîne.
Wî perwerdeya xwe ya bingehîn li dibistanên Girkê Legê xwend, li wir ji sirûdên cotkaran û palevanan wî peyvên xwe yên yekem verêstin û ji stranên jinan li zeviyên pembo û awazên şivanan li çîmenan helbestên xwe vehûnand, Xwezaya ku li dorê wî mamosteya wî ya yekem bû di hûnandina helbest û nivîsarên wî de, di wijdana wî de ferhenga despêka jiyanê û pêşgotina avakirina hişmendiya wî ya çandî û ramyarî afirandin.
Wî xwendina xwe heta qonaxa navîn qedand, di navbera Girkê Legê û Rimêlanê de, lê tevlîbûna wî ya zû di meşa azadî û têkoşîna neteweyî de di destpêka ciwanîya wî de, bû sedema ku dev ji kursiyên dibistanê berde û beşdarî xebata siyasî û têkoşîna çandî bibe.
Ji destpêka ciwanîya xwe ve, wî pênûsa xwe wek çakeka hişyariyê hilgirtû peyv wî berdêla tifengê hesab kir dema ku meydan lê teng dibû, wî di navbera xemên rewşenbîr û hestyarîya helbestvan de hevrêzîyek çêkirû dest bi lêgerîna dengê xwe yê taybet kir di warê wêje û helbestê de, şevên dirêj rêhevalê destpêkên wî bûn, li ber ronahiyê fenerê peyvên tije bi xem û hesret dinivîsand, ku di hundir wan de banga xakê û êşa mirovê Kurdî vedigot.
Ji kolanên Girkê Legê û zeviyên Rimêlanê, peyvên xwe yên yekem berhev kirû ji pêlawazên xwezayê ferhenga helbestî saz kir, wî bikûrahî li dengên şivanan di çîmenan guhdar dikirû wan vediguhêre sirûdên nivîsî û wî çavdêriya sabra cotkaran dikir li bin tîrêjên tava havînê û ew vediguherand wêneyên helbestî yên tije bi wate , ev têkildana di navbera karê rojane û sembolîk de hişte ku ew ji hevalên nifşê xwe cuda be, ji ber ku wî di her tevgera mirovan de û di her peyvek ji axaftinên wan de materyalek zindî ji bo helbest û nivîsa wêjeyî didît.
Bi tevlîbûna xwe ya zû di têkoşîna neteweyî de, helbestên wî êdî ne tenê stranên xwezayê an jî pesnê jiyana gundewariyê bûn, lê bûn rêgezek ji bo berxwedana çandî. Helbestên wî yên pêşîn qîrînên azadiyê hildigirtin û banga girêdana bi zimanê Kurdî ve dikir wekî nasname, bîranîn û hebûn, ji bo wî helbest veguhêrî pirek ku paşerojê bi dema îroyîn re girêdide û çiraxek ku riya hevdemên xwe di dema tarî û windabûnê de ronî dike.
Ji destpêkên xwe ve ew girêdayî mîrateya wêjeya Kurdî ya klasîk û hemdem bû, wî pirtûkên Cegerxwîn, Ehmedê Xanî, Seydayê Tîrêj û yên din yên şehsiwarên peyva Kurdî dixwend, ev xwendin bû çavkaniyek ku zuha nebe, wî veguherand di warê nûjeniyê de û zimanek helbestî yê taybet bo xwe afirandin ku hevbexşiyê dike di navbera hêsanî û kûrahiya sembolîk de.
Bi vî rengî êdî li cem wî helbest ne tenê nivîsar in, lê penaheke ji bo hêviya, neynikeke bo nasnameyêû pireke di navbera paşerojê, niha û pêşerojê de.
Afrîneriya Kemal tenê bi helbest, çîrok û gotarê nehatîye sinor kirin, lê her weha gihişte qada rojnamegeriya Kurdî, li wir ew bi deng û nêrînên xwe beşdarî veguhastin û şirovekirina bûyeran bû, wî hevrêzî di navbera peyva edebî û kiryara rojnamegerî de çêkir, da ku bibe rewşenbîrê ne ku tenê çavdêriyê bike, lê divê di çêkirina hişmendiya civaka xwe de jî beşdar be û parastina peyama xwe bike di her tiştên ku wî nivîsî û weşandî de.
Di nîvê salên notan de, dest bi nivîsîna helbestên xwe yên yekem bi zimanê Kurdî kir û nivîsarên wî di kovarên herêmî de hatin weşandin, piştî wê dengê wî bi derketina malperên Kurdî ên elektronîk re berfireh bekav bû.
Di dawiya salên notan de, ew ber bi Bêrûtê ve çû, li wir tevlî rojnamegeriyê bû û ji bo çend salan wekî sernivîserê kovara Sorgul bi zimanê Erebî xebitî, bi berdewamî peyama peyva azad diguhest û dengê Kurdî pêşkêşkir di gerdûna erebîya fireh de, li wir jî ew giha baweriyê ku helbest û rojnamegerî du rûyên yek tiştî neû yê rewşenbîrî divê di civaka xwe de şahid û çalak be, ne tenê temaşevan be.
Kamal helbesta azad û nûjen bi rengek zindî dinivîse, ji ber vê yekê ew ji klasîkên Kurdî kulîlka wan ya yekem digire, dûv re jî di nav axa nûjeniyê de diçîne ku nivîsek nû der dikeve holê, ne bi tevahî kevneşopî yeû ne jî nûjenekî ji koka xwe veqetî ye.
Di nivîsên wê de, wêneya dayikê û welat, dilber û şoreş, xwen û bêhêvîtî tên diyar kirin, li ba wî helbest ne hema tenê afirandineke, lê çekeke ku parastina nasnameya Kurdî dike ji windabûnê.
Girkê Legê û Dêrik, bi şevbuhêrkên xwe yên helbestî û dîdargehên xwe yên çandî bûn gerdûnek jîndar ji bo pêşxistina hinêra wî,



ew têgihişt ku helbest peyam û berpirsiyariye berî ku bibe xweşviya zimanî.
Ew di sala 2005’an de zewicî ye û ew bavê sê zaroka ye _ yek kur û du keç _ ku jiyana wî bi evîn û germbûnê dagirtine.
Wî di dirêjahiya karîyera xwe ya wêjeyî de çend dîwanên helbestî weşand:

1. Kezîzer – Bêrût, 2002
2. Bîstikek Guneh –Şam, 2006
3. Dilên Navser – Qamişlo, 2019
4. Danên bi Çêja Peyva Destpêkê – Qamişlo, 2021
5. Şevbêrkên Spî – Weşanên HRRK, 2022
6. Derengî Xewnê – Qamişlo, 2023
7. Rojnivîsên Beybûnê – Qamişlo, 2024
8. Helbestên Bijarte – Qamişlo, Weşanên Komîteya Hunerê, 2024

Reşnivîseka wî bi navê “ Peyîz” li benda çapkirinê ye.
Ew beşdarî gelek çalakiyên çandî û siyasî bûû tevlî damezrandina komên edebî û ramyarî ên veşartî û eşkere bû, ku armanca wan vejînkirina hişmendiya neteweyî ya Kurdî bû li hemberî polîtîkên çewisandin û piştguhkirinê, wî didît ku parastina zimanê Kurdî parastina xwedîbûnê ye, ji ber vê yekê helbestên xwe bi Kurdî nivîsandû weşandina wêneya Kurdî wekî şêwazek ji berxwedanê hesab kir.
Dîtina wî xuya bû ku çand yek ji çavkaniyên têkoşîna neteweyî ye; ew nasnameyê ji windabûnê diparêzeû bîranîna civakî dide gel û li pêşiya wan asoyên azadiyê vedike, bi saya pabendbûna xwe, dengê wî bû yek ji dengên ku bîrdanka gelêrî ya Kurdî diparêzeû nifşan bi bîr tîne ku huner û wêje ne şehyanin, lê berpirsiyariya neteweyî ne.
Têkoşîna wî ya çandî ji çalakiya wî ya siyasî ne cuda bû, her dû têkilî hev bûn, her helbesta ku wî nivîsî bû, helwestek bû, her helwesteka ku wî digirt berdewamîya wî ya helbestî an wêjeyî hebû.
Bi vî rengî wî nimûneyek ya rewşenbîrê berxwedêr nîşan da ku peyv di xizmeta xak, nasname û azadî de tê bikar anîn.
Li gel nivîsîna helbestê, ew bi çalakî tevlî jiyana çandî û ramyarî bû, ew bû endamê desteya rêvebir a Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK)ê û endamê Dîwana wêjeyê ya Bakur û Rojavayê Kurdistanê,
Herwiha endamê komîteya nirxandina helbest û şanoyan di nav festîvalên edebî deû di sala 2018’an de xelata yekem a pêşbirka Mihemed Bilal Yûsif ya helbestê li Efrînê wergirt.
Ew niha di beşê Kurdî yê Ajansa Nûçeyan A hawarê (ANHA) de wekî edîtorê beşê Kurdî dixebiteû her hefte nivîsên xwe di rojnameya Ronahî de diweşîneû her wiha gotarên wî ên ramyarî û rewşenbîrî di kovarên, Rojava, Sîwan û Şermola de têne weşandin, bi vê çalakiya cotikî di navbera helbest û rojnamegeriyê de, kemal Necim wêneyê rewşenbîrê ku ji bo peyv û kiryarê bi hev re dinivîse nîşan da, ku bibe şahidê serdema xwe û belgedarê êş, hêvî û daxwazên gelê xwe ber bi azadî û rûmetê ve.
Helbestvan Kemal di wêjeya Kurdî ya nûjen de nişaneke zelal hişt, bi rêya dîwanên helbestî, gotar û lêkolînên çandî, nivîsarên wî ne tenê nivîsên wêjeyî bûn, lê êş û zehmetiyên wijdanî û ramyarî bûn, ew taybetmendiyên serdema xwe hildigireû êşên gelê xwe û xewnên wî nîşan dide û berhemên wî yên wêjeyî bûn xezîneya bîranîna neteweyî û neynika ruhê nifşê wî ku di navbera xewn û bê hêvîtiyê, di navbera înkar û hêvî de dijiya.
Helbestvan Kemal hîn jî di xurtbûna dayîn û afirîneriya xwe de ye, helbestan diafirîne û bi şêwazê xwe yê taybetî vedihûne, ew tovên hêviyê û jiyanê di dilê nifşên pêşerojê de bi ronahiya peyvê û bîhnxweşiya xwecîbûnê diçîne.
Bi rêya helbestên xwe, rêçikên hişmendiya neteweyî û têkoşîna çandî ronî dike, peyama azadî û rûmetê digihêjîne,
û tekez dike ku peyva afrîner hêza wê heye ku nasnameyê biparêze û pêşerojek geş ava bike.

# Ji ber qutbûna dabînkirinê, nirxê gaza Ewropayê ji sedî 30 zêde bû

Ji ber şerê ku li Rojhilata Navîn derketiye, buhayên gazê li Ewropayê bi qasî ji sedî 30 zêde bûye ku bandoreke mezin li bazarên enerjiyê çêkiriye herwiha metirsiya ji qutbûnên dabînkirinê yên dirêj zêde kir.

**Navenda Nûçeyan**

Bihayên gaza xwezayî li Ewropayê bi berdewamiya şerê li Rojhilata Navîn bilind bûn, ku bazarên enerjiyê dihejîne û barkirinên dabînkirina deryayî asteng dike. Peymanên pêşerojê heya roja Duşemê di 9'ê Adarê de bi rêjeya ji sedî 30 zêde bûn di heman demê de piştî zêdebûna heftane ya herî mezin ji aloziya enerjiyê ve, bilindbûna xwe dirêj kirin.

Bihayê peymana gaza xwezayî ya Hollandî TTF, ku ji bo Ewropayê lêvegereke, berî ku hinekî dakeve, gihîşt 69.50 €. Tevî zêdebûnê jî, biha li jêr asta gihîştinê mane dema ku şerê Ukraynayê di sala 2022'an de dest pê kir.

Ev zêdebûn piştî bilindbûna buhayê petrolê zêdetirî astên 110 dolarî ji bo her bermîlekî tê, ji ber ku hilberînerên sereke yên Rojhilata Navîn hilberînên xwe kêm kirin di heman demê de girtina Tengava Hirmizê a berdewam bi bandor maye. Herwiha peymanên gaza xwezayî yên pêşerojê li Dewletên Yekbûyî jî bilind bûn ku di mehekê de gihîştin asta herî bilind.

**Ji ber şerê Îranê nirxê gaze bilind bûye**

Pevçûn berdewam dike bêyî dîtina tu nîşanên kêmbûnê, ev yek rewşa nezelaliyê di bazarên enerjiyê de zêde dike di heman demê de zextên enfelasyonê jî zêde dibe. Bi taybetî di derbarê bazarên gazê de, Ewropa di rewşek nebaş de ye, ji ber ku ji zivistanê bi tankên depoyên vala derdikeve. Ev tê vê wateyê ku ew ê neçar bimîne ku vê havînê barkirinên bêtir ya gaza xwezayî ya LNG bikire da ku rezervên xwe tije bike. Eger herikîna gazê ya Rojhilata Navîn negihîje bazarên cîhanî, dê bi Asyayê re ji bo dabînkirina sînorkirî pêşbaziyê bike.

**Texmînên berdewamiya nearamiyê**

Florence Schmidt, pispora di stratîjên enerjiyê li Rabobank, ji ajansa Bloomberg News wiha gotiye: "Bazar hêdî hêdî dest pê dike ku rastiya qutbûnên dabînkirinê yên dirêj li seranserî rêze nirxa enerjiyê fam bike." Lê zêde kir: "Em dibînin ku ev qutbûnên dabînkirinê wê bi qasî sê mehan berdewam bike."

Biha hîn jî ji astên qiyasî ên di dema aloziya enerjiyê de pir kêmtir in, ku niha gihîştiye nêzî 64 Euro ji bo her megawatt-saetê, li gorî lûtkeya dîrokî ya ku zêdetirî 300 Euro derbas kiribû.

**Projeya Ras Laffan a Qeterê**

Projeya gaza xwezayî ya Ras Laffan a Qeterê, ku mezintirîn projeya cîhanê ye, piştî girtina



wê ya bêhempa ya hefteya borî, xuya dike ku bi piranî saxlem e. Lêbelê, wezîrê enerjiyê yê Qeterê ji Financial Times re got, ji nû ve destpêkirina operasyonan û vegerandina dabînkirinê dibe ku çend hefteyan an jî bi mehan bidome. "Qeter Energy" hefteya borî piştî rawestandina hilberîna gaza xwezayî û berhemên têkildar, ji xerîdarên xwe yên bandordar re rewşa diwar ya mezin ragihandibû, ku bandor li kirînerên Ewropî yên wekî Edison a Îtalyayê û Orlen a Polonyayê kir.

Ji aliyê xwe ve, analîstên Goldman Sachs pêşbîniya xwe ji bo buhayên gaza Ewropî di çaryeka duyemîn de ku ji 45 euroyan dê bighêje 63 Euro ji bo serê megawatt-saetê, kirin, ev yek jî li gorî bendewariya berdewam a astengiyên li ser hinardekirina Qeterê. Ev pêşbînî texmîn dike ku barkirinên LNG yên Qeterê dê heta dawiya Adarê, ji bo demek dirêjtir ji ya ku di destpêkê de dihat texmînkirin wê di sifirê de bimînin û piştre dê gav bi gav başbûnek di dabînkirinê de çêbibe ku dê heta piraniya Nîsanê bidome.

# Buhayê penêr di aramiyeke berbiçav de ye

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Îbrahîm Mamo ku xwediyê firoşgehek penêr li bazara Qamişlo ye, piştrast kir ku buhayên penêr îsal li gorî sala borî tu guhertinek mezin nedîtiye û got, "Dê di destpêka werzê penêr de, wê mîqdarên mezintir li bazaran û zêdebûna çalakiya firotanê hebe."**

Penêr xwarineke sereke ye li ser sifreya welatiyên Sûriyê bi giştî û bi taybetî li kantona Cizîrê. Di salên borî de buhayên penêr bi awayekî berbiçav bilind bibû û ji ber aloziya aborî ku bandor li hemû warên jiyanî kiribû piraniya malbatan ji kirîna penêr bê par diman û kevneşopiya hilanîna penêr wekî mûnet winda bibû, lê îroj hêvî hene li gorî firoşkarên bazara bajarê Qamişlo xuya dibe ku aramiyeke berbiçav a buhayê penêr wê bê dîtin.

**Werzê penêr**

Werzê hilberîna penêr bi gelemperî di biharê de ye, ji destpêka Adarê heta nîvê Gulanê. Cureyên herî baş



ên penêrê mûnetê di nîvê Nîsanê de têne amadekirin, ji ber ku ev meh nîşana berhemdariya herî zêde ya erdên giyayî ye. Tevî demsala îsal ya tijî barîna baranê ye lê heya niha buhayên wê wekî xwe mane ku divyabû li gorî başbûna demsala zivistanê buhayên penêr kêm bibe.

Li gorî xwediyên firoşgehan ku pisporên firotina penêr û berhemên şîr in, bazarên bajarê Qamişlo bi destpêkirina werzê penêr re çalakiyeke nerm a kirîn û firotinê dibînin û li gorî sala burî buha jî di aramiyeke berbiçav de ne.

Derbarê buhayên penêr û çalakbûna serdanên welatiyan ji bo kirîna penêr firoşkarê penêr Îbrahîm Memo ji rojnameya me re axivî.

**Bihayên penêr li bazarên Qamişlo**

Firoşkarê penêr Îbrahîm Memo ku firoşgeha wî li bazara sebzeyan ya kevin li bajarê Qamişlo ye diyar kir ku serdanên welatiyan ji bo kirîna penêr heya astekê baş e lê ne di asta çalakbûnê de ye û wiha anî ziman: "Serdanên welatî û malbatan li gorî zehmetiyên aborî ji bo kirîna penêr heya astekê baş tê dîtin. Di heman demê de buhayên penêr wekî xwe ma ne wekî heman sala borî, welatî dibînin ku bihayên zeytûnan û kel û pelên din ê xwarinê heman buhaya penêr e, lewma kirîna penêr ferztir û baştir dibînin ji ber faîdeya wê ya tenduristî û xurekî."

Îbrahîm Memo wiha berdewam kir: "Bihayên penêr îsal heman ya sala borî ye, bi nirxê 30 hezarî dighême ji bo penêrê pez û çêlekan û firotina wê bi 35 heya 40 hezarî ye, ji xwe penêrê pez bihatir e."

**'Pitî Remezanê wê mîqdara penêr zêde bibe'**

Mihemed Memo destnîşan kir ku piştî bidawîbûna meha Remezanê wê mîqdara penêr û hilberîna wê zêdetir bibe û wiha got: "Piştî Remezanê wê werzê penêr destpê bike, hilberîna penêr wê zêde bibe, lewma ez texmîn dikim wê mîqadara penêr bi awayekî zêdetir û berfireh li bazaran bê peyda kirin herweiha wê çalakbûneke berbiçav di bazaran de çêbibe."

**'Dibe ku mîqdara firotinê jî zêde bibe'**

Mihemed Memo texmîn dike ku di demên pêş de wê mîqdarên zêdetir ên penêr bifroşin û wiha got: "Niha rojane ji 100 heya 120 kîlo penêr em difroşin, ez pêşbînî dikim ku di rojên pêş de dema hilberîn û çalakbûna werzê penêr dê firotin zêde bibe û dibe ku firotina wê bighêje ji 200 kîlo heya tonekî."

Îbrahîm Memo wiha berdewam kir: "Niha em penêr ji gundên derdora Qamişlo tînin, lê piştî cejna Remezanê bi destpêka werzê penêr ez ê ji bajarê din jî bînim wekî Hesekê û Dêrikê." Wekî tê zanîn bajarên Hesekê û Dêrikê bi taybet di hilberîna kalîteya penêr de pir navdarin.

Îbrahîm Memo di dawî de diyar kir ku têkiliyên wan bi bazirgan û hilbirînerên penêr ên bajarên din hene da ku ji wan re penêr peyda bikin û di bazaran de li ber destê welatiyan peda bimîne.



# Ji bo Rojhilata Navîn projeya Netewa Demokratîk dermane

Rêber Apo Netewa Demokratîk wekî çareseriyeke bingehîn ji bo pirsgirêkên Rojhilata Navîn pêş dixe, da ku şerên navneteweyî û etnîkî bi dawî bîne. Rêber Apo dibêje: "Eger Neteweya Demokratîk giyan be, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk beden e."

**Stêrk Mihemed**

Ji bo erdnîgariya berfireh û tevîlhev ya Rojhilata Navîn ku hemû pêkhate û netew cihê xwe tê de digirin projeya Modernîteya demoktarîk ya ku Rêber Apo dide pêş ya herî guncaw e. Ji bo pêşî li şerê mezhebî were girtin projeya herî serkeftî ya netewa demokratîk e. Nimûneya wê ya herî ber bi çav Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû ku hemû pêkhate û netewan bi hevre jiyan dikirin. Niha jî li Rojavayê Kurdistanê ev proje didome da ku hemû pêkhate bi hevre jiyan bikin, parastina maf û kevneşopiya hemû pêkhateyan tê kirin.

**Moderníteya demoktarîk çi ye?**

Modernîte; li hemberî desthilatdarî, terzê jiyanê û ramana ku azadî, demokrasî, humanîzmê û mafên mirovan diparêze ye. Herwiha tê wateya ku civak terzê jiyana xwe li gorî şert û mercên nû diguherîne, lê ya berê înkar nake, tenê veguherînê pêk tîne. Modernîzm tevî wateya xwe ya giştî xwedî wateyekî felsefîk e jî. Ev têgeh di felsefeyê de ji bo rewşengeriyê jî tê bikaranîn. Yanî wekî ramaneke ku li ser bingehê humanîzm, gerdûnîbûn, demokrasiyê bilind dibe û civaka mirovan wekî navend digire, tê pênasekirin. Ger ku em rastiya "Mirov bêyî civakîbûnê nikarin bijîn û bi civakîbûnê re dibe mirov" li ber çavan bigirin, modernîte tê wateya "terzê jiyana civakê ya demekê." Bi gotineke din modernîte terzê jiyanê yê civaka li derveyî dewletê dimîne ye. Ango di aliyê madî, manewî û exlaqî de terzê jiyana civakê ya serdemekê ye. Rêber Apo di vê çarçoveyê de moderníteyê wekî, "çax, serdem" binav dike. Ji bilî aliyê madî, manewî û exlaqî, peyva moda jî li ser ve dike û bi giştî wekî "terzê jiyanê yê civakê" pênase dike.

**Netewa Demokratîk tê çi wateyê?**

Rêber Abdullah Ocalan di parêznameya xwe ya 'Sosyolojiya Azadiyê' de behsa neteweya demokratîk dike û wiha pênase dike: "Neteweya demokratîk di navbera komên çandî û ziman de yên ku bi heman rêbazî dijîn yan jî mîna hev di civakeke xwedî exlaq û siyasî de dijîn, tê bicihkirin. Veguherîna civakî di çarçoveya siyaseta demokratîk de pêk tîne. Di neteweya demokratîk de êl, qebîle, pêkhate û heta malbat di civaka xwedî exlaq û siyasî de wek yekîneyên ji aliyên ziman, zarava û çandî ve cihêreng, cihê xwe digirin û ew vediguherin neteweyeke nû. Helbet nabe komeke nîjadî yan jî mezhebî yan jî îdeolojîk taybetmendiya xwe li ser vê neteweyê ferz bike."

Di neteweya demokratîk de her herêm dikare rêveberiya xwe ya xweser li gorî taybetmendiya xwe ragihîne. Rêber Abdullah Ocalan di vî warî de wiha dibêje: "Eger neteweya demokratîk giyan be, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk beden e." Herwiha rêber Abdullah Ocalan di parêznameya xwe ya 'Doza Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk' de felsefeya neteweya demokratîkde 9 rêgezên ku di pratîkê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk dihatin û niha jî Rojava nimûneya wê ye, dinirxîne.

**Çima Rêber Apo netewa demokratîk dide pêş?**

Rêber Apo netewa demokratîk wekî çareseriyeke bingehîn ji bo



pirsgirêkên Rojhilata Navîn pêş dixe da ku şerên navneteweyî û etnîkî bi dawî bîne, jiyaneke bi rûmet û wekhev ji bo hemû pêkhate, bawerî û gelan ava bike, li hemberî netew-dewleta ku dibe sedema zext û parçebûnê, jiyaneke demokratîk, exlaqî û polîtîk pêk bîne û herêmê ji kaosê rizgar bike. Li şûna şerên li ser navê neteweperestiyê, modela netewa demokratîk bingeha xwişk û biratiya gelan û baweriyan diafirîne. Netewa demokratîk li hemberî têgihîştina teng a netew-dewletê ku dibe sedema zext û qirkirinê, derdikeve û jiyaneke bi hev re diparêze. Ew civakeke ku bi xwe xwe bi rê ve dibe, exlaqî û polîtîk e (Konfederalîzma Demokratîk) dike armanc. Bi taybetî li Rojhilata Navîn, ku erdnîgariyeke tevlîhev e, ev model ji bo dawîanîna li şerên sedsala 21'ê û afirandina aştî û aramiyê wekî pêwîstiyekê tê dîtin. Bi kurtasî, Rêber Apo netewa demokratîk wekî alternatîfa herî guncaw a ji bo demokrasî, azadî û hevgirtina gelan li hemberî alûziyên kûr ên Rojhilata Navîn pêş dixe.

**Kî êrişî projeye moderníteya demokratîk dike û çima?**

Di vê dema dawî de û bi taybet piştî êrişa di 6'ê Çile li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêkhat, herwiha 18'ê Çile li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek êriş li ser moderníteya demokratîk û biratiya gelan a ku Rêber Apo dide pêş çêbû. Armanc ji van êrişan ku di navbera Kurd û Ereban de pevçûnan avabikin û di navbera pêkhateyan de şerê navxweyî di Sûriyê de derxînin pêş û li Sûriyê bibe şerê Kurd û Ereban. Armanc ji van êrişan ewe ku projeya moderníteya demokratîk ji holê rabikin û têkbibin. Ev êriş di esas de bi plana dewleta Tirk hatiye rêxistinkirin ku gelê Rojava û Rêber Apo ji hevdû dûrbixîne. Dewleta Tirk bi rêya şerê taybet hewildide tecrûbeya bi salan a moderníteya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkbibe. Herwiha êrişên li ser Rojava yên ku bi piştevaniya dewleta Tirk têne kirin, armanca wê ya sereke modela civaka demokratîk ya ku Rêber Apo dide pêş û gelek guhertin di nava civakê de pêkaniye têkbibe. Ji ber ku gelek dewletên alîgirê şer dizanin ku bê projeya netewa demokratîk li pêşiya qeyranên li Rojhilata Navîn ne gengaze were girtin.

**Modela civaka demokratîk sazîbûn û rêxistina gelan avadike**

Modela civaka demokratîk ya ku Rêberê gelê Kurd Ebdullah Ocelan dide pêş, ya ku rêxistin û sazîbûna gel ava dike, nimûnaya wê jî Bakur û Rojhilata Sûriyê bû ku ji 2012'an ve ji destpêka Şoreşa Rojava hemû gel, pêkhate, netew û reng bi hevre di nava van herêman de jiyan dikin. Herwiha Rêveberiya Xweser a Demokratîk mînaka herî berbiçav bû, ku di nava saziyên xwe de hemû pêkhate dihewandin, ji bo azadî û mafê hemû pêkhateyên li Sûriyê xebat dikirin. Ev modêla civaka demokratîk li pêşiya qeyranên mezin girtin ku wê li Sûriyê şerê mezhebî yê bê dawî qewimîba. Her çiqas niha êriş li ser vê projeyê hebe jî, lê ew ji bo gelê Rojhilata Navîn deriyek ji jiyana bi aştî û aramî re ye. Rojhilata Navîn erdnîgariya wê berfireh, tevlîhev û gelek pêkhateyan di nava xwe de digre, ji bo vê yekê û ji bo bi dawî anîna alûziya şer a li Rojhilata Navîn projeya Modela civaka demokratîk ya ku hemû gelen bi hevre girêdide ya herî guncawe.

# “Rojhilata Navîn li ser Volkanekê”

**Botan Amed**

Wisa xuya dike ku Rojhilata Navîn vê dawiyê ketiye nav aloziyeke jeopolîtîk a nû û kûr. Aloziyên leşkerî û siyasî yên li ser Îranê ne tenê krîzek bi du an sê dewletan ve sînordar mane, lê veguheriye hevkêşeyeke ewlehiyê ya berfirehtir ku Tirkiye, Sûriye û Iraqê dihewîne. Lêkolîneke li ser hevsengiyên heyî yên herêmê nîşan dide ku ev pêşketin ne tenê bûyerên leşkerî yên yekser in; berevajî vê, ew nîşanên pêvajoyeke stratejîk a demdirêj in ku dikare mîmariya hêza Rojhilata Navîn ji nû ve şekil bide. Wêneya encam nîşan dide ku dewlet ji polîtîkayên ewlehiya sînor ên klasîk derdikevin û hewl didin ku hevsengiyên hêza herêmî ji nû ve diyar bikin. Stratejiya dawî ya Îranê yek ji hêmanên herî berbiçav ên vê serdema jeopolîtîk a nû ye. Hikûmeta Îranê nêzîkatiyek ewlehiyê ya hişktir dipejirîne ku hem kapasîteya wê ya leşkerî û hem jî qada bandora wê ya herêmî tekez dike. Pêşketina pergalên mûşekan û çalakiya leşkerî ne tenê amadekariya leşkerî lê di heman demê de peyamek siyasî ya bihêz ji bo reqîban nîşan dide. Bi rêya vê nêzîkatiyê, Îran armanc dike ku kapasîteya xwe ya astengkirinê li herêmê zêde bike û zextên li dijî wê hevseng bike. Wekî din, xuya dike ku nîqaşên potansiyel ên hevsengiya hêzê di nav siyaseta navxweyî ya Îranê de bi helwestek hişktir di siyaseta derve de têne hevseng kirin. Ev rewş, ku di dîrokê de li gelek welatan hatiye dîtin, têkiliya di navbera xurtkirina siyasî ya navxweyî û hişkkirina siyaseta derve de ji nû ve tekez dike. Van pêşketinan bandorên rasterast li ser Tirkiyeyê jî dikin. Mîna piraniya krîzên li Rojhilata Navîn, Tirkiye ji ber cihê xwe yê erdnîgarî û kapasîteya xwe ya leşkerî û siyasî di navenda pêşketinan de ye. Rageşiya li ser Îranê bi du awayan bandorê li hesabên ewlehiyê yên Tirkiyeyê dike. Ji aliyekî ve, xetereyên leşkerî yên rasterast ên wekî ewlehiya sînor û parastina hewayî derdikevin pêş, lê ji aliyê din ve, encamên aborî û dîplomatîk ên bêîstîqrariya herêmî derdikevin holê. Ji ber vê yekê, zêdebûna amadekariyên parastinê yên Tirkiyeyê û aktîvkirina mekanîzmayên ewlehiyê yên vê dawiyê ne tenê wekî tedbîrek leşkerî lê di heman demê de wekî beşek ji stratejiya astengkirina herêmî jî tê hesibandin. Armanca sereke ya vê nêzîkatiyê ew e ku pêşî li bandora rasterast a dînamîkên pevçûnê yên li Rojhilata Navîn li ser sînorên Tirkiyeyê bigire. Mîna her krîzek mezin a li Rojhilata Navîn, ev pêvajo rasterast bandorê li qada Sûriyeyê dike. Sûriye, bi salan e, bûye xaçerêyek stratejiyên herêmî, qada şer ji bo hêzên reqabetê. Siyasetên Îran, Tirkiye, Rûsya û aktorên din ên navneteweyî bi berdewamî di vê qadê de hevsengiyên nû diafirînin. Hebûna avahiyên siyasî û leşkerî, bi taybetî li bakurê Sûriyeyê, di hevkêşeya ewlehiya herêmê de roleke girîng dilîze. Ev herêm ne tenê qadeke şer e ku hêzên leşkerî lê pevçûnê dikin; ew di heman demê de wekî qadeke ceribandinê derdikeve pêş ku modelên rêveberiyê yên cûda û şêweyên rêxistina civakî derdikevin holê. Ji ber vê yekê, pêşketinên li Sûriyeyê ji bo mîmariya siyasî ya pêşerojê ya Rojhilata Navîn girîngiya sembolîk û stratejîk hene. Di vê peyzaja herêmî ya tevlihev de, deverên ku civakên Kurd lê dijîn jî bûne qadeke jeopolîtîk a girîng. Her ku hevsengiyên hêzê li Rojhilata Navîn diguherin, herêmên ku Kurd lê dijîn hem ji hêla siyasî û hem jî ji hêla leşkerî ve cihekî girîng digirin. Ev rewş hin derfetan, lê di heman demê de xetereyên cidî jî bi xwe re tîne. Krîzên herêmî pir caran dibin sedema ku civakên herêmî bêtir xuya bibin û bala aktorên navneteweyî bikişînin ser van herêman. Lêbelê, ev heman pêvajo di heman demê de xetera kişandina civakên herêmî di navenda pêşbaziya hêzê ya mezin de jî hildigirin. Ji ber vê yekê, pirsgirêka herî krîtîk ji bo avahiyên civakî yên li herêmê şîrovekirina rast a hevsengiyên jeopolîtîk ên guherbar û pêşxistina stratejiyên ku dê ewlehiya demdirêj misoger bikin e. Dema ku li dîroka Rojhilata Navîn tê nihêrtin, tê dîtin ku dabeşkirinên etnîkî an mezhebî pir caran di demên krîzê de têne bikar anîn. Destpêkirina dabeşbûnên weha dikare bibe beşek ji hesabên stratejîk ên hêzên herêmî. Ji ber vê yekê, parastina hevsengiya civakî û xurtkirina mekanîzmayên diyalogê di navbera gelên cûda de ji bo aramiya herêmî pir girîng in. Bi taybetî li herêmên ku Kurd, Ereb, Tirk û gelên din bi hev re dijîn, parastina têkiliyên aştiyane ne tenê ji bo ewlehiya herêmî lê di heman demê de ji bo aramiya tevahiya Rojhilata Navîn faktorek diyarker e. Nirxandina pêşketinên heyî senaryoyên cûda ji bo pêşeroja Rojhilata Navîn eşkere dike. Yek ji wan ev e ku rageşiya di navbera Îran û reqîbên wê de di asta bûyerên leşkerî yên sînorkirî de dimîne û venaguhere şerekî herêmî yê mezin. Di rewşek wisa de, hevsengiyên hêzê yên heyî dikarin bi piranî werin parastin, û krîz dikare bi rengek kontrolkirî were birêvebirin. Îhtîmalek din jî ev e ku rageşî berfireh bibe, veguhere qadeke pevçûnê ku rasterast bandorê li welatên wekî Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê dike. Ev senaryo ne tenê dê encamên leşkerî hebin, lê di heman demê de dikare hevsengiyên aborî û siyasî yên li herêmê jî bi kûrahî têk bibe. Îhtîmalek sêyemîn û xuya ye ku aramtir e, ji nû ve aktîvkirina kanalên dîplomatîk û alî rageşiyê di astek kontrolkirî de bihêlin. Ev hemû pêşketin nîşan didin ku Rojhilata Navîn di pêvajoyek veguherînek nû de derbas dibe. Gavên stratejîk ên Îranê, polîtîkayên ewlehiyê yên Tirkiyeyê û hevsengiyên hêzê yên aloz ên li Sûriyeyê rasterast bandorê li hev dikin. Ji ber vê yekê, pêşketinên li herêmê divê ne tenê ji perspektîfa welatekî tenê, lê ji perspektîfek jeopolîtîk a berfireh werin nirxandin. Pêşeroja Rojhilata Navîn dê bi giranî bi awayê ku ev hevsengiyên hêzê têne şekildan ve girêdayî be. Lêbelê, bidestxistina aramiya mayînde hewce dike ku ewlehiya civakî, beşdariya siyasî û mekanîzmayên diyaloga herêmî xurt bibin, ne ku tenê li ser pêşbaziya leşkerî bisekinin. Li Rojhilata Navîn a ku ev hêman lê nehatine xurtkirin, her çend agirbestên demkî mimkun bin jî, derketina aştiyek mayînde pir ne mimkûn xuya dike.


E.Pêjder Altan

## Têkoşerek ji dil: Bavê Welat

Ew ne tenê navek bû; ew temsîla rêwîtiyek siyasetmedarê kurdperweriyê dikir, ya îradeyek e ku çemên şîlo û xumamî derbas dibe ye. Di awirên wî de bêdengiya deştekê berfireh ên Kurdistanê û di helwesta wî de jî, serhildana Çiyayên Torosê hebû. Ji bo wî, siyaset ji qesreke mermerî bêtir bêhna axa şil bû. Li ser milên xwe yên westiyayî, ew hêviyên mirovên ku qet nedîtiye, paşerojên zarokan û duayên extiyaran hildigirt. Dema ku ew diaxiviya, gotinên wî êdî dengên asayî nabin; carinan ew bi qasî şelaleyekê geş bûh, carinan bi qasî dengê herê nazik û carinan ew wekî dengê rastiyê diqîrin. Ew mîna dareke çinarê bû ku li hember herikîna demê li ber xwe dide. Rehên wî di kûrahiya dîrokê de ne û şaxên wî di şîniya rojên ku hîn çênebûne de ne. Dema ku bahoz diqelişin, ew bi bayê re nareqise; ew tenê helwesta xwe hişk dike, rehên xwe di erdê de teng dike. Pirek ku mirovan dike yek, pirek baweriyê li ser zinaran hatiye avakirin...
Dibêjin siyasetmedar ne strana xwe, lê destana neteweyê dibêje. Ew hem qelem û hem jî kaxezê wê destanê ye. Em qala Bavê Welat, an go Salih Muslim ku di 75 saliya xwe de li nexweşxaneyek li Hewlêrê ku lê dihat dermankirin, koça dawî kir, dikin. Bavê Welat, wekî nûnerê xêzekê ku prensîbên wekî xwerêveberiya demokratîk, encumenên herêmî, temsîliyeta jinan û avahiyek siyasî ya nenavendî diparêze, dihat nasîn. Di yek ji hevpeyvînên wî yên dawî de, tekez li ser pêwîstiya “destûrek beşdar û pergalek nenavendî” ji bo çareseriyek mayînde li Sûriyeyê, axên bingehîn ên vîzyona wî ya siyasî kurte kir.
Li ser asta navneteweyî, ew wekî kesayetek ku bi nêzîkatiya xwe ya nerm, jêhatîbûna danûstandinê û şêwaza ravekirina krîzên tevlihev, bi taybetî di ravekirina dîplomatîk û rewakirina ezmûna Rojava de, derket pêş, dihat nasîn.
Mirina wî wekî dawiya serdemek dirêj di siyaseta Rojava û dînamîkên herêmî yên tevgera Kurdî de hate dîtin.
Çîroka jiyana wî têkoşînek pir-qatî temsîl dike, ji pîşeyek teknîkî bigire heya aktorek siyasî ya herêmî, di navbera zext û danûstandinê de diheje, bandorek li ser asta herêmî û navneteweyî dihêle.
Herî girîng ew rêhevalê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bû. Rêhevaltîbûna wî ya bi Rêber Apo re ku ew bi xwe di sala 2016’an de dema min pê re roportaj kir, qala bandorbûna wî ya li ser fikir û ramanê Rêber Apo dikir, tanî ziman. Hêj jî ew gotina wê di guhê min de ye, wiha got : “Rêhevaltiya bi Rêber Apo re, têkoşîn û têkoşeriyeke jidil û can pêwîst dike. Ev jî bi rastî di fêmkirina fikir û ramanê Rêber Apo de derbas dibe.”
Jiber vê yekî jî di siyaseta xwe de, dîplomasiya dimeşand, têkiliyê bi însanan re, bi hêsanî wê nêzîkatiya xwe û jidilbûna xwe dida der.
Jixwe dema agahiya koça wî ya dawî hate ragihandin, helwest û nêzîkatiya ji siyasetmedar, rewşenbîr, hemû aliyên civakan a ji bo wê pir watedar bû. Ji bo paraztina hemû civakên di serî de Kurdistanê û tevahî Rojhilata Navîn, hewildanê dikir, jidilbûna wî dihat hîskirin.
Oxir be têkoşerê jidil, oxir be Bavê Welat…!

# Êdî divê di hemû waran de Efrînî xwe bi rê ve bibin

**Reşo Mihemed**

Bê guman ji sala 2018’an ve dosya herî bi girêk û asteng li tevahiya Sûriyê, dosya koçberan bû. Ji ber ku ev dosya girêdayî rewşa siyasî ya ku dihate jiyîn. Vê dosyayê du rêjîm derbas dikirin. Ji serdema rêjîma Baas ve Rêveberiya Xweser û QSD’ê dixwestin bi rêjîmê re vê dosyayê çareser bikin, di heman demê de bi hêzên muxalefetê yên wê demê bigihêjin lihevkirinekê da ku koçberên Efrînê vegerin warê xwe, lê rewşa siyasî ya wê demê ne alîkar bû. Sedem jî ew bû ku hêzên navdewletî nedihiştin û nedixwestin ku ev dosya çareser bibe. Di wê demê de Îran, Rûsya û  di serî de dewleta Tirk. Dewleta Tirk ne ji berjewendiyên xwe didît ku koçberên Efrînê vegerin warê xwe. Dagirkeriya Tirk bi zanebûn guhertina demografîk li Efrînê çêkir, Erebên ji deverên cuda yên Sûriyê anîn deverên Kurdî da ku nijadperestiyê û kîndariyê di nava gelê Kurd û Ereb de ava bike, hem jî da ku dewleta Tirk bi serê xwe û li gor kêfa xwe daran bibire, zeytûnan bidize û erda Efrînê bikar bîne ji bo berjewendiyên xwe, hebûna Kurdan li Efrînê dihat wê wateyê ku eger Kurd li wir hebin ew ê bêdeng nemînin li hember dewleta Tirk, lê eger Ereb bin ew ê nikarin serê xwe li ber dewleta Tirk rakin ji ber ku ne cih û warên wan e. Piştî hilweşîna hikumeta Baas êdî vegera koçberên Efrînê bû dosya girîng û zextekê li ser dewleta Tirk. Piştî destpêkirina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk herwiha peymana dawîn a di navbera QSD-Rêveberiya Xweser û hikumeta demkî ya Sûriyê de, êdî ji bo vegera koçberan dewleta Tirk bêdeng ma, wekê ku qebûlkirinekê ji hêla wê ve pêkhat da ku koçberên Efrînê bi aramî bigihêjin warê xwe û vegerin malên xwe.
Di çarçoveya bicihanîna peymana 29’ê Çileyê ya di navbera QSD û hikumeta demkî ya Sûriyeyê de, koma yekemîn a koçberên ji Efrînê yên li herêma Cizîrê ber bi warê xwe bi rê ketibûn. Koma yekemîn a koçberên ji Efrînê ku ji 400 malbatan pêktê, bi amadebûna Hêzên Ewlekariya Hundirîn, cîgirê fermandarê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Hesekê Mehmûd Xelîl û ji fermandarên Hêzên Asayîşê Nesrîn Abdullah û hejmareke berpirsên hikumetê yên girêdayî vê dosyayê duh ber bi warê xwe ve bi rê ketibûn. Karwanê koçberan ji sedan erebeyan û otobusên taybet ên Meclisa Koçberên Efrîn-Şehbayê û Parastina Sivîl a Sûriyeyê pêk tê di bajarên Reqa, Tebqa û Helebê re derbas bûn û di saetên berbanga îro ve gihaşt Efrînê. Koma piştî 8 salan ji koçberiya bi darê zorê, ji aliyê xelkê Efrînê ve bi stran û dahol û zireniyê gi girseyî hat hat pêşwazkirin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn di 7’ê Adarê de ragihandibû ku dê koma yekem a koçberên Efrînê yên ji navçeyên Şiyê, Cindirês û Mabata yên Efrînê dê 9’ê Adarê ji Cizîrê ber bi Efrînê ve here. Mehmûd Xelîl ku bi komê re bû, ji çapameniyê re got xebat ji bo vekirina korîdoreke ewle ber bi Efrînê ve di nav 3 rojan de, tê kirin û hewldanên vegera hemû koçberan beriya Newrozê, dewam dikin. Tiştekî tekez e ku  ev veger bi rengekî ewle weke yekem car hat pêkanîn. Bê guman vegera ku çêbû encama kar û xebata dibplomatîk a ku Rêveberiya Xweser da meşandin, pêkhat. Vegera koçberan yek ji bendên peymana 29’ê Çileyê ye ev dosya di her civînên berê dihatin lidarxistin de hebû, ji ber ku di pêkanîna aramiya herêmê û tevahî Sûriyê de xwedî cihekî girîng bû.
Divê bi vê gavê re gavên din jî werin avêtin da ku koçberên din ên Sûriyî bikaribin vegerin herêmên xwe di nav de jî koçberên Serêkaniyê, Girê Spî û herêmên din. Vegera koçberan li warên wan gaveke erênî ye, lê pêwîst e ev yek di çarçoveya vegera ewle de ku rûmeta şêniyan biparêze, vegerandina mal-milkên wan werin misogerkirin û rastî astengî û gefan neyên de be û hişyarî li ser binpêkirinan de ku wê bandorek neyînî li bicihanîna bendên peymanê bike. Divê di serî de dewleta Tirk û çeteyên wê ji Efrînê û tevahiya herêmên dagirkirî derkeve. Di heman demê de şîneyên Efrînê bajar û herêma xwe ji hemû waran ve bi rê ve bibin.



# Newroz sembola roj û destpêkeke nû ye

Peyva Newroz tê wateya “nû” û “roz” jî tê wateya “roj”, ji ber vê yekê Newroz sembola roj û destpêkek nû ye. Ew destpêka salek nû û vegera biharê pîroz dike, demsalek bi girîngiya giyanî ya mezin ku sembola serkeftina qenciyê li ser xerabiyê û şahiyê li ser xemgîniyê ye.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Wateya Newrozê**

Newroz, ku hem bi Farisî û hem jî bi Kurdî tê wateya “Roja Nû”, bêhempa ji hêla gelek gel û olên li seranserê parzemînên cuda ve tê pîrozkirin. Bi mîlyonan Faris, Azerî, Tirkmen, Tacîk, Ozbek û Kazak wê pîroz dikin. Her wiha mirovên li Makedonyaya Bakur, Başûrê Qefqasyayê, Qirim, Balkanan, Keşmîr, eyaleta Gujarat a Hindistanê û Bakurê Rojavayê Çînê jî newrozê pîroz dikin. Ew di heman demê de li gelek welatan, di nav de Îran, Iraq, Kirgizistan û Azerbaycan, cejnek giştî ye. Her çend Newroz ji bo piraniya van koman bi bûyerên olî an çandî yên ku dîroka wan 3 hezar sal berê ve girêdayî be jî, di demên nûjen de di nav Kurdan de xwedî karekterek neteweyî ya cuda ye. Ew bûye bûyerek salane ku bi rêya wê ew nasnameya xwe ya neteweyî ji nû ve piştrast dikin û daxwazên xwe yên ji bo mafên siyasî û neteweyî nû dikin, nemaze li Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê.

**Cejna Newrozê**

Newroz yan jî Cejna Newrozê, cejneke çandî û dîrokî ye ku ji aliyê gelê kurd û gelek gelên din ên herêmê ve her sal di meha Adarê de li seranserê cihanê tê pîrozkirin. Di serdema nûjen de cejna Newrozê di çanda kurdan de wekî cejna azadî û vejînê her sal di 21ê adarê de li seranserê Kurdistanê tê pîrozkirin. Li gorî mîtolojiya Newrozê Kawayê Hesinkar di vê rojê de li dijî serdarê zilimkar a Dehaq serhildan pêk aniye û wî têk biriye. Bi têk birina Dehaq re gelên bajêr ji bin zilmê rizgar dibin û ev roj ji bo gelên bajêr dibe roja rizgarî û şahiyê. Ji ber vê yekê cejna Newrozê ji aliyê kurdan ve wekî cejna azadiyê, cejna vejînê û wekî roja şiyarbûna xwezayê tê pîrozkirin. Tê texmînkirin ku li seranserê cihanê ji aliyê 300 milyon kesan ve her sal Newroz tê pîrozkirin. Tê texmînkirin ku li seranserê cîhanê pîrozbahiya herî mezin a girseyî pîrozbahiya Newroza Amedê ye ku her sal bi beşdariya sed hezaran kesan li Amedê tê organîzekirin. Cejna Newrozê 3 hezar sal e ku ji aliyê gelên Kurdistanê, Asyaya Navendî, Qefkasya û Behra Reş, Balkan û Asyaya Başûr ve tê pîrozkirin.

Cejna newrozê ji aliyê çandî ve

Newroz demek e ku mirov bi hev re tên ba hev, bi cil û bergên xwe yên herî rengîn û xweşik li derve pîroz dikin. Di van pîrozbahiyan de, agirê Newrozê tê vêxistin, mirov li dora wê govendê digerînin, stranên kurdî têne gotin û xwarinên taybet têne amadekirin. Ev kevneşopî ne tenê şahiyekî tîne, lê di heman demê de hestên yekîtî û nasnameya neteweyî jî xurt dike. Herwiha, bihara ku bi Newrozê re dest pê dike, wekî sembola ji nû ve zindîbûnê tê dîtin; çawa ku xweza piştî zivistana sar bi kulîlk û rengên nû vedibêje, Newroz jî hêviya ji nû ve destpêkirinê û ronahiyê dide mirovan.
Newroz ji bo kurdan ne tenê cejneke xwezayî ye ku bihata biharê nîşan dide, lê di heman demê de bîranîna têkoşîna wan a dîrokî û hevdem e. Ew roj e ku gelê kurd bi agirekî sembolîk him zilmê dişewitîne him jî hêviya azadiyê di dilê xwe de zindî dihêle. Ji ber vê yekê, Newroz îro jî bi coş û kelecan tê pîrozkirin û wateya wê her ku diçe kûrtir dibe.

**Pîrozkirina cejna Newrozê li Rojavayê Kurdistanê**

Li Rojava, gel 21’ê Adarê wekî sembola azadî û nûjeniyê pîroz dikin. Amadekarî di 9’ê Adarê de bi xemilandina kolanan dest pê dikin û agirê Kawayê Hesinkar ji 14’ê Adarê ve li meydan û taxan têne vêxistin. Malbat cilên gelêrî yên rengîn ên Kurdî li xwe dikin û pîrozbahî bi çalakiyên çandî, stran û govendên kevneşopî dihewîne. Agirê Newrozê sembola navendî ya serkeftina li ser zilmê ye. Jin, mêr û zarokên Kurd cilên rengîn û kevneşopî yên Kurdî li xwe dikin. Tevgera Çand û Hunerê ya Mezopotamyayê (TEV-ÇAND) û Tevgera Hîlal Zerîn li gelek bajaran, di nav de Qamişlo, Hesekê, Kobanî, Dêrik û Amûdê, rê û resmên hunerî li dar dixin. Her wiha di 21‘ê Adarê de gotarên ku li ser çîroka Kawayê Hesinkar û sembola wî ya rizgarbûnê ji bindestiyê, têne pêşkêş kirin. Ev



pîrozbahî derfeteke ji bo xurtkirina yekîtiya Kurdan û nîşandana pabendbûna bi nasname û çanda Kurdî re.

**Pîrozbahiya cejna Newrozê li Başûrê Kurdistanê**

Li Başur, kurd di 21’ê Adarê de Newrozê wekî Sersala Kurdî û cejneke neteweyî û dîrokî ku sembola rizgariyê ye pîroz dikin. Pîrozbahî derketina nav xwezayê, lixwekirina cilên rengîn ên gelêrî yên Kurdî, pêxistina agir (meşaleyên Nowrozê) wekî sembola serkeftinê û pêşkêşkirina govendên gelêrî. Gelê Başûr dibêjin ku agir hêmana navendî ye, lewma li ser giran, li malan û di pîrozbahiyên mezin ên civakî de pêdixin, ku sembola çîroka Kawa Hesinkar û serkeftina ronahiyê li ser tariyê ye. Mêr, jin û zarok cilên gelêrî yên kurdî yên rengîn li xwe dikin, ku nasname û çanda kurdî diyar dikin. Malbat ji bo pîknîk, çêkirina xwarinê û dîlan û muzîka kurdî diçin çiya, baxçe û qadên kesk.

**Pîrozbahiya cejna Newrozê li Bakurê Kurdistanê**

Li Bakurê Kurdistanê kurd di 21’ê Adarê de bi coşeke mezin Newrozê pîroz dikin, wê wekî sembola azadî û biharê dibînin. pêxistina agirên mezin li serê çiyayan û li meydanên giştî, li xwe kirina cilên rengîn ên Kurdî, pêşkêşkirina dîlanên kevneşopî û organîzekirina meş û festîvalên çandî yên mezin, bi taybetî li bajarên wekî Amed û Şirnexê. Pêxistina agirên mezin rêûresma herî girîng e, ku tê de agirên mezin wekî sembola serketina li ser zilmê. Di dîrokê de, pîrozbahî bi rûbirûbûna bi sînorkirinên ewlehiyê ve girêdayî ye, lê ew wekî nasnameyek neteweyî û çandî ya kûr maye, di van demên dawî de wekî cejnek neteweyî û çandî nasnameyek berfirehtir bi dest xistiye.

**Pîrozbahiya cejna Newrozê li Rojhilatê Kurdistanê**

Li Rojhilat Newroz wekî cejneke neteweyî ya Kurdan û Sersala Farisan tê pîrozkirin. Pîrozbahî di destpêka Adarê de dest pê dikin û di 21’ê Adarê de digihêjin lûtkeyê. Pêxistina agir li ser lûtkeyên çiyayan, lixwekirina cilên rengîn ên gelêrî yên Kurdî, pêşkêşkirina reqsên gelêrî yên komî, derketina nav xwezayê. Her wiha derketina nav xwezayê û baxçeyan, amadekirina xwarinên kevneşopî û sazkirina şahîya. Jinên kurd di organîzekirin û beşdarbûna çalak a pîrozbahiyan de roleke navendî dilîzin. Li Rojhilat newroz fersendek e ji bo nûkirina nasnameya neteweyî ya Kurd û çalakiyên çandî û hunerî ji bo îfadekirina mîrata Kurd têne lidarxistin.

**Amadekariyên newroza 2026‘an**

Îsal ji tevî hemû şert û mercên ku cîhan têre derbas dibe û êrişên ku li ser gelê kurd pêk tên jî lê gelê kurd li seranserî cîhanê amadekariyên xwe dikin da ku bi moral û heyecanekî mezintir pêşwaziya vê cejnê bikin. Lewma gelê kurd ji 14’ê Adarê ve dest bi çalakiyên cûr bi cûr dikin da ku ew mîras û kevneşopiya ku berî hezarê salan dihat pîroz kirin berdewam bikin û ji cîhanê re isbat bikin ku rewşa herêmê çi be jî gelê kurd dev ji rê û resmên xwe bernadin.


Hafiz Ahmet Turhalli

## CEJN Û KÊFXWEŞÎ

Îsal meha Adarê buye meha cejnan. Cejna meya Netewî Newroz û cejna Remezanê ketine peyhev.
Gelê Kurd ev zêdetirî sed saliye cejnên xwe bi kêfxweşî derbas nekirine. Cejn bi wateya xwe ya bingehîn kêfxweşîye.
Jiber di meha remezanê de Qur’ana pîroz hatiye daketin û Pêxemberê me Hz Muhemmed s,a,w bi Pêxemberî hatiye erkdar kirin ev meh pîroze.
Jiber mirovê bawermend hişmendiya xwe nuh dike, ji tiştên xirab xwe paqij dike û digîhêje armanca xwe cejnê dike. Erebên ku di nîvgirava Suudî de dijîn, hevdû dikuştin, ji azadiya manewî, maddî û aborî bêparbun û dinava xizaniyêde bun bi hatina Îslamê pêşketin. Bi daketina Qur’anê tevliheviya baweriyan û sîstema ku binavê baweriyê kedxwarî dikir ji holê rakir.
Cejin bi wateya serkeftinan û destkeftiyan tê pêkanîn. Meha Remezanê mirov xwe amade dike û bi îbadetên şexsî xwe ji gunehan paqij dike, piştî ji kêmasi û gunehan xelas dibe, cejnê heq dike. Beriya bixwe weke kesayet cejnê bike, divê der û dora xwe kesên aboriya wan nebaş, alîkarî û hevkariyê wan bike, lewre cejn tenê bi takekesî pêknayê. Divê der û doro mirovjî karibe bi rastî cejnê bike û kêfxweşî bibe ya hemû civakê.
Bi kurtasî cejn divê civakê kêfxweş bike, nexweş werin zîyaret kirin, dê, bav û hawîrdor jidil ve werin pirsîn, dakû kêfxweşî li hemu çînên civakêde were dîtin.
Newroz jî cejna Kurd ya netewîye. Heta van salên dawî ji hêla dagerkerên Kurdîstanêve weke derveyî zagonan dihate dîtin. Li Turkiyê bi hezaran mirov jibo beşdarbuna cejna Newrozê, hatin qetil kirin û bi sed hezaran hatin zîndanî kirin. Dema nikaribun bi tirs û zorê pêşî li cejna Newrozê bigrin, destpêkirin gotin: ev cejna tirkiyatiyêye, hêk şikênandin û cejn lihevdu pîroz kirin. Jibo karibin naveroka cejna Newrozê vala bikin, hemû hêza xwe bikar anîn. Jibo cejna netewa me heram bikin bi hezaran kesên binavê muftî û melayan, derxistin ser ekranên televîzyonan û ser mîmberên Mizgeftan û cejna Kurdan ya Newrozê binavê Îslamê weke heram bi kesayetên oldar dan nasîn.
Gotin pîroz kirina cejna Newrozê, agir perestiye û herame.
Jiber prensîbê ola wan ne yên gerdunî û Xwedayî bu, ligor hêz û tirsê jî ev ol tê guhertin.
Em îro dibînin li Suriyê jî kesên bi darê zoro û binavê Îslamê tevdigerin, dibêjin me Newroz weke cejnê pejirandiye û di rojên cejna Newrozêde, em bêhnvedanê bikin.
Gelo çi çêbu olekî nuh hat? Ev Cejna kû heram bu, çawa bu cejna dewletê û dewlet jî bêhnvedanê pêk tîne?
Ola Xwedê, Îslam di prensîbande, şeref û îzzeta kesayetan û ya civakan diparêze.
Ola Xwedê henekî tiştan li henekî milletan helal û henekî milletên dîtirre heram nake! Ger nêzikbunên bivê rengî derbikevin holê, divê em zanibin ev ne ola Xwedêye, berovajî ev ol ya desthelatdar û ya ol firoşane.
Milletê meyê hêja bi tekoşîna xwe, mafê cejna xweya Netewî bidest xistiye, lê hêjî me azadiya xwe bi temamî pêk neanîye.
Cejnên me herdujî ketin pey hev, 20 Adarê cejna Remezanêye û 21 Adarêjî cejna Newrozêye.
Bi hêviya kû ev cejnên me azadî û aşitiya me misoger bikin. Cejnên me pîroz bin.